Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1368 15-Nîsan-2026 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Cejna nûbûna jiyan û xwezayê: Çarşema Sor

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

**Çarşema Sor yek ji cejnên herî pîroz ên civaka Êzidî ye, ev roj wekî sersal û destpêka nûbûna jiyan û xwezayê tê pîrozkirin. Li gorî baweriya civaka Êzidî ev roj sembolîzmek kûr bi xwe re tîne ku bi afirandin, ronahî û destpêka gerdûnê ve girêdayî ye.**

Cejna Çarşema Sor, yek ji cejnên herî pîroz ji bo Civaka Êzidî ye, ew wekî sersala û destpêka nûbûna jiyan û xwezayê tê pîrozkirin. Ev cejn dikeve roja çarşema yekem a meha Nîsanê li gorî roznameya rojhilatî û li gorî baweriya Civaka Êzidî sembolîzmek kûr bi xwe re tîne ku bi afirandin, ronahî û destpêka gerdûnê ve girêdayî ye. Êzidî vê cejnê li deverên ku lê bicih dibin weke Sûriyê, Tirkiyê, Iraq, Îran û li deverên cûda weke Ezrebîcan, Rûsya û gelek dewletên Ewropî bi taybet Almanyayê pîroz dikin.

Li gorî baweriyên civaka Êzidî, Xwedê afirandina gerdûnê di Çarşema yekem a Nîsanê de temam kiriye, ji ber vê yekê navê Çarşema Sor wekî roja afirandinê hatiye girtin. Ji bo amadekariya cejnê, jin û mêr di sibeha cejnê de li perestgeha Lalişê, cihê pîroz ê Civaka Êzidî, dest bi pêçandina zeytûnan dikin û 365 çira, yek ji bo her rojê salê, bi karanîna rûnê zeytûnê yê paqij vêdixin.

**Navê wê ji ku derê hatiye?**

Êzîdî dibêjin ku jê re Çarşema Sor tê gotin ji ber ku di vê rojê de Xwedê xwîn xistiye laşê Adem, bi vî awayî jiyan aniye Erdê. kulîlka Nîsanê di sibeha Çarşemê de vedibin, ji ber vê yekê ew xwe û malên xwe bi wan dixemilînin.

**Rêûresmê wê çi ne?**

Çarşema Sor wekî roja afirandin û destpêka gerdûnê tê hesibandin. Ji ber vê yekê, ev roj ji bo Civaka Êzidî pîroz û bi nirx e, ku zû şiyar dibin, cil û berg û xemlên xwe yên herî xweşik li xwe dikin û malên xwe bi kulîlka Nîsanê û roniyan dixemilînin. Kesên ku dikarin qurbanek pêşkêş dikin, çi pez, golik, berx, bizin, an lawirek wisa be. Keç û xort bi boyaxkirina 12 hêkên kelandî dest pê dikin, her 3 hêkan bi rengê yek ji werzên salê boyax dikin û wan di nav tasekê de li navenda malê datînin. Li gorî baweriya wan, hêk sembola giroveriya erdê ye û kelandina hêkan nîşana cemidandina erdê ye û qalikê hêkê piştî kelandinê sembola helandina qata qeşayê ji rûyê erdê ye, di heman demê de rengên geş ên hêkan bihar û destpêka jiyanê nîşan didin.

Sibeha Sêşemê ya beriya cejnê, xelk serdana gorên hezkiriyên xwe yên mirî dikin, her cûre fêkî û şêraniyan bi xwe re dibin da ku li zarok û feqîran belav bikin. Di vê rojê de cotkirin jî qedexe ye, ev yek dihêle ku xweza geş bibe û kulîlk vebin. Êzîdî ji zewaca di vê mehê de dûr dikevin ji ber ku ew bawer dikin ku ev yek dê şansê xirab bîne jiyana wan. Li gorî baweriya wan, Nîsan bûka salê ye.



**Çar cejn di yekê de**

Li gorî baweriya Civaka Êzidî, Çarşema Sor wekî pîrozbahiya çar cejnên ku di wateyê de bi hev ve girêdayî ne tê hesibandin.

Teqîna atoma spî ji qîrîna Xwedê, ku ji wê ax, av, hewa û agirê pîroz çêbûn da ku gerdûnê dest pê bike.

Kelandina erdê, dişibihe kelandina hêkê, erd piştî teqînê hişk bû, geş bû û kesk bû.

Cejna Afirandinê, qonaxa ku xwîn diherike nav laşê yekem, Adem ku jiyan jê dest pê kir.

Cejna Bereketê, bereketa hêka yekem ku dibe sedema afirandina zindiyê yekem.

Agir ji bo Civaka Êzidî pîroz e ji ber ku ew ji ronahiyê hez dikin û ji tariyê nefret dikin, ji ber vê yekê ew di cejna xwe de çira vêdixin da ku ronahiyê belav bikin. Di seranserê dîrokê de, Êzîdî ji hêla gelên ku li kêleka wan dijîn ve ji ber kevneşopiyên wan ên rêzgirtina agir bi agir hatine tawanbarkirin. Cejna Çarşema Sor xwedî aliyên ku ji rêûresmên pîrozbahiyê wêdetir diçin e, ji ber ku ew nasnameyeke kolektîf a ku kok di dîrokê de ye û peyameke aştî û jiyana hevbeş dide, nemaze di ronahiya dijwarî û trajediyên ku civaka Êzîdî derbas kiriye de, ku ya herî berbiçav qirkirina Civaka Êzidî bû, ku vê cejnê dike fersendek ji bo bîranîna berxwedan û hêviya ji bo pêşerojek çêtir. Di navbera dema berê û niha de, Çarşema Sor hîn jî bûyerek bêhempa ye ku dewlemendiya mîrata Êzîdî ronî dike û berdewamiya jiyanê tevî hemû şert û mercan piştrast dike.

## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER AŞTIYÊ**

**Destek bi zor, yek bi xweşî:**
- Kesê navcîtiyê dike, carna nerm dike, carna dişidîne.

**Deriyê xwe jê re vekir:**
- Mêvantiya wî qebûl kir.

**Em darekê di navbera xwe de daynin:**
- Em li hev werin; bila êdî di navbera me de nexweşî dernekeve.

**Vî goştê genî ji nava xwe biavêjin:**
- Li hev werin.

**Vî hestiyê genî ji nava xwe biavêjin:**
- Bi heman wateyê.

**LI SER ÇÊNEBÛNA TIŞTÊN BAŞ JI TIŞTÊN NEBAŞ, YAN YÊN XWEŞ Û MEZIN JI YÊN PIÇÛK Û HINDIK**

**Bihar bi gulekê xweş nabe:**
- Bi tiştên pir hindik tiştên pir baş çênabin; bi tişteke pir piçûk xweşiyên pir mezin çênabin.

**Bihar bi gulekê nayê:**
- Bi heman wateyê.

**Bi gulekê bihar nayê:**
- Bi heman wateyê.

**Bîr bi çotê tijî nabe:**
- Bi tiştên hindik bi tiştên piçûk tiştên baş bi destê mirov nakevin.

**Bîr bi dewlan tijî nabe:**
- Bi heman wateyê.

**Çar mal nabin gundek, çar mû nabin rihek:**
- Ji tiştên hindik hêz dernakeve.

**Ji serê qijniyê nanê patîle çênabe:**
- Ji tiştên, piçûk, tiştên beredayî tiştên baş, tiştên biqîmet çênabin. Nanê patîle: Qelî û pîvazê dixin navê li ser sêlê çêdikin. Carna giyê, penîr û tiştên din jî dixin navê.

**Ji şîlanê nîr û halet çênabin:**
- Ji tiştên lewaz tiştên baş çênabin; ji kesên pîs hêviya qenciyê nayê kirin.

**Parsek qereparsek ji wan çêdibin:**
- Ji tiştên nebaş tiştên baş dernakevin.

**Sed derzî nabin gêsin:**
- Tişteke baş li şûna sed tiştên nebaş e; sed tiştên lewaz nagihin qama tiştekî xurt.

**Sêv li sorsorikê nakeve:**
- Ji tiştên lewaz tiştên bihêz çênabin.

**(Sorsorik giyayekî weke qamirê ye)**

**Siwarê kera digihe bêndera:**
- Bi tiştên lewaz karê baş dernakeve.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî



📷 Bi kamîreya Ayşa Silêman

---

## ‘Heta Rêber Apo û girtiyên zindanan azad nebin aştî ne pêkan e’



Dayika Aştiyê Afîfe Kartal diyar kir ku baweriya wê bi dewleta Tirk nayê, heta ku girtiyên zindanan û Rêber Apo azad nebin, nikare were gotin ku aştî heye û got, “Mafê hêviyê yên girtiyan pêk nayê, lewra heta ku zarokên me di girtîghehan de bin, em ê qîr bikin.”**R-5**

## Hewesa bedewiyê polîtîkayeke sîstematîk ji aliyê pergalê li ser jinê ye (1)



Nişterkarî ango emeliyatên xweşikbûnê yên jinan di serdema nûjen de polîtîkayeke sîstamatîk e û di nav jinan de hatiye belavkirin. Li seranserê cîhanê salane zêdetirî 37 milyon nişterkariyên xweşikbûnê çi bi birîndarî û ne birîndarî be, li ser jinan têne kirin.**R-2**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1368 15-Nîsan-2026 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# ‘LI PÊŞIYA YEKÎTIYÊ TU HINCET NEMANE’

Mamosteyê Zanîngeha Rojava, Beşîr Mele Newaf diyar kir ku şert û mercên îro li pêşiya yekîtiya Kurdî tu hincet nehiştine û yên baweriya wan bi yekîtiyê hebe pêwîst e pêkbînin.**R-4**




## Di dîrokê de yekem peymana kevnar ya aştiyê; Peymana Kadeşê




Peymana Kadaşê di dîrokê de yekem peymana aştiyê ya nivîskî ye ku di navbera Împaratoriya Misrê û Împaratoriya Hîtîtan de, li ser axa Mezopotamyayê hatiye îmzekirin. Piştî şereke dijwar û demdirêj îmzekirina vê peymanê rê li pêşiya şer û pevçûnan girtiye, deriyekî nû ji diyalog û çareseriyê re vekiriye.**R-7**

## Piştî 60 salan mafê welatîbûnê yê Kurdên Sûriyê vedigere

Doza kesên neqeydkirî (mektûm) yek ji dozên herî aloz di Sûriyê de ye, niha piştî 60 salan ji bêparbûna ji mafê welatîbûnê, hêvî vedgere.**R-3**

## Ji çiraxên wêjeya Kurdî

Helbestvan Ciwan Dêrikî; Çavkaniya ku naçike û fenera qet melûl nabe, wî gotinên xwe kirine xizmeta parastina nirxên neteweyî, ziman û nasnameya gelê Kurd. Bi saya tecrubeya xwe ya dirêj, ew beşdarî parastina zimanê Kurdî û dewlemendkirina wê bû ji aliyê bedewiyê ve, helbest kir amûra berxwedanê û parêzvana nasnameyê.**R-9**



## Girîngiya stratejîk a Tengava Hurmizê di cîhanê de

Di naveresta Kendava Erebî de Tengava Hurmizê wekî yek ji girîngtirîn rêyên deryayî yên veguhestinê di cîhanê de tê nasîn. Rêjeyeke mezin ku bi qasî çareyeke bazirganiya petrol û gaza xwezayî ya cîhanê di vê tengavê re derbas dibin.**R-11**





Dîsa Peyamên Rêber Apo
Farûk Sakik R-4



DAIŞ’ê bê deng mezin dikin!
Dilyar Cizîrî R-6



Tevî cezayên Qeyser hatin rakirin jî, lê kirîz berdewam in
Ehmed Hesen R-7



Entegrasyon di Pêvajoya Şoreşa Demokratîk de: Dînamîkek ku Têkoşînê Kûrtir Dike
Gulîstan Xalid R-10

# Hewesa bedewiyê polîtîkayeke sîstematîk ji aliyê pergalê li ser jinê ye (1)

Nişterkarî ango emeliyatên xweşikbûnê yên jinan di serdema nûjen de polîtîkayeke sîstamatîk e û di nav jinan de hatiye belavkirin. Li seranserê cîhanê salane zêdetirî 37 milyon nişterkariyên xweşikbûnê çi bi birîndarî û ne birîndarî be, li ser jinan têne kirin.

Esma Mistefa

Em di nava sîstemeke pergalî de jiyan dikin ku ji cewher, xwebûn û rastiya xwe gelekî dur difikre û li şûna wê, girîngiya herî mezin em didin şekê derve. Pîvanên xweşikbûna însanan bûye çiqas ji derve de xweşik, balkêş û çiqas bandor dike ye. Ji nêrandin û naskirina hundirê cewherî wî/wê însanî wêdatir, mirovahî, beşeriyet di serdema heyî de bi nexweşiya xweşikbûna dervede re rûbirû maye. Ev yek ji rêbazên pergala sermeyedar û moderîteya kapîtalîst ya ku bi her serdemekê re siyaset û polîtîkayên xwe yên mijûlkirin û bandorkirina mirovahiyê û civakan diguhere ye. Di vê rapora xwe de me xwest em serî li yek rêbazên ku di serdema nû de hatiye derketin û pêşketiye, bînin ser ziman û hinek şîrove bikin, yek ji diyardeyên herî bi rîsk jî belavbûna zêde ya niştерkariyên xweşikbûnê di nava jinan de ye. Ger em dibêjin bi taybet di nava jinan de ev nayê wê wateyê ku mêr jî bi vê diyardeyê bandor nebûne û pêk naynin.

**Di demên kevin de gelo rêûrêbazên xweşikbûnê ango bi çi awayî jinan xwe dixemilandin û xweşik dibûn?**

Bi hezaran salan e, lêgerîna bedewiyê ne diyardeyeke nûjen bûye, lê belê beşek resen ya jiyana jinan di çandên cûda de bûye. Tevî nebûna teknolojiyên bijîşkî yên pêşketî yên ku em îro dizanin, jinan di demên kevnar de gelek rêbaz ji bo parastin û baştirkirina şemala xwe çêkirin ku hin ji wan xwezayî bûn, û yên din jî nêzîkî têgeha destpêkê ya "cerrahiya kozmetîk ango niştерkariya xweşikbûnê" bûn.

Jinan gelek girîngî didan xuyabûn, şekil û şemala xwe, ji bo xêzkirina çavên xwe kil, ji bo şilkirina çermê xwe rûnên xwezayî û ji bo têkoşîna li dijî çirçikandinê dermanên giyayî bi kar dianîn. Xweşikbûn ne tenê weke xweecibandin ango jinên ku di astên zengînbûnê de bû, lê bi rewşa civakî û tenduristiyê ve girêdayî bû ku hemû jinan ev yek bi destê xwe dikir. Hemû alav û berhemên ku dihatin bikaranîn xwezayî û ji xwezayê dihatin derxistin.

Mînak; Li Misra kevnar, xemilandin ne luks(refahiyê) bû, lê pêdiviyek bijîşkî û bawerî bû. Jinên Misrî bi kohl (Kil) navdar bûn ku ne tenê bedewiya çavên wan zêde dikir, lê di heman demê de ji mada (galena) jî dihat çêkirin ku wan ji tîrêjên rojê û enfeksiyonên (kulbûn) çavan biparêze. Nefertîtî û Kleopatra di karanîna serşokên şîr û hingiv de ji bo şilkirina çerm û henna ji bo boyaxkirina neynûk û porê de pêşeng bûn ku şêwaza wan heta roja îro tê bikaranîn.

Li Ewropaya kevnar, çermê sipî standarda sereke ya bedewiyê bû ku ew nîşaneya jiyana kesên zengîn û nexebtandina di bin tavê de bû. Jinên li Yewnanistan û Romayê, tevî jehrîbûna vê madê jî; ji bo ronîkirina rûyê xwe tozên madeya "risasa sipî" bikar dianîn. Her wiha wan di porê xwe yê bi zêr û mircanan xemilandî de jî pir serketî bûn û rûnên ji gul û giyayan dihatin derxistin bi kar dianîn.

Li Hindistana kevnar, nivîsên bijîşkî yên ku emeliyatên hêsan ên ji bo tamîrkirina pozê vedibêjin (mîna cerrahîya kozmetîkî ya îroyîn), bi taybetî di nivîsên bijîşk Sushruta (Soşrota) de hatine dîtin.

**Zêr û Kevirên Hêja: Jêhatîbûna Mezopotamyayê**

Li mezopotamyayê gelek keşif û afrênerên destpêkê yên mirovahiyê hatine derxistin, hin ji wan jî di mijara xweşikbûn û estetîkbûûna jinê de bûn. Di şaristaniyên Sumer û Babîl de, bedewî bi zêrên giran ve girêdayî bû. Jinan tac û guharên zêrîn ên bi kevirên hêja xemilandî li xwe dikirin. Di heman demê de tê gotin ku wan yekemîn kesên ku lêvsorik derxistine. Lêvsorik bi kolandin û hurkirina kevirên rengîn û tevlîhevkirina wan bi rûn û zeytan re, hatiye çêkirin.



Îro, bi pêşketinên mezin ên di bijîşkiyê de, niştерkariyên xweşikbûn berbelavtir bûne, lê bingeha wan vedigerin wan hewildanên destpêkê yên jinan di demên kevnar de. Ji ber vê yekê, dikare were gotin ku xwesteka bedewiyê ne berhema serdema nûjen e, lê belê ew dirêjahiya dîrokeke dirêj a nûjenî û ceribandinê ye.

Me xwest beriya em derbasî mijara di roja îro de çawa jin xwe bi niştерkariyên xweşikbûn, şekil û şemela xwe ji por bigre heyanî şeklê laşê xwe, diguherînin û jê nerazîne, hinekî balê bikşînin ser şêwaz û rêbazên jinan di serdemên kevnar de. Jinan dîsa bi bedewî û xweşikbûna xwe re mijûl dibûn lê hemû bi afrandin û berhemên xwezayî dihate kirin ku ev yek bandor li ser wan nedikir tersî wê, bi tendurist bû. Em werin di serdema nûjen de çima ewqas diyardeya niştерkariyên xweşikbûn û estetîkê belav bûne û weke ku ger nebin, nabe ye.

**Hewesta bedewiyê polîtîkayeke sîstematîk ji alyê pergalê li ser jinê ye**

Di salên dawî de, emeliyata kozmetîkî êdî ne tenê hilbijartinek takekesî ye, lê bûye diyardeyek gerdûnî ya mezin dibe, bi daybet di nav jinan de. Bi pêşketina mezin a tibba xweşikbûnê û hêsaniya gihîştina klînîkên pispor re, ev cure emaliyat bûne beşek ji şêwaza jiyana nûjen.

Ev geşbûn êdî ne tenê bersivek ji bo çareserkirin an pêdiviyek dermankirinê ye, lê hêdî hêdî veguheriye tiştek ku dikare wekî "hewesa bedewiyê" were binavkirin; heweseke ku ji xwesteka normal ya baş xuyabûnê wêdetir diçe, karekterek mecbûrî dike ku were avakirin da ku di çavê civakê de bi awayeke herî xweşik bê xuyakirin. Ev yek jî nexweşiyeke ku bi rêveçûna zihniyeta sermeyedar ya li ser jinê ve girêdayî ye. Ji ber ku em dizanin ev pêşketinên ku bi taybet weke Şerê Taybet di nava pergalê de li ser jinan tên kirin, bi destê pergal û zihniyeta kapîtalîst a ku dixwaze her tim jinê ji xwe re bikar bîne, tê birêvebirin.

Ev hewes êdî bi jinan ve sînordar nîne, lê belê berfireh bûye ku mêr, kur û keçan jî di nav xwe de digire ku ev yek ji aliyê çanda wêneya îdeal ya bê qusur ve ku ji hêla platformên medyaya civakî û navdaran ve tê pêşve xistin, bandor bûye. "Wêneya fîltrekirî" ji wêneya rastîn bêtir belav bûye, û "zêdekirina kozmetîk" bûye rêyek ji bo bidestxistina pejirandin ango ecibandina civakî.

Di nav vê meylê de, tibbê kozmetîkî di qadeke krîtîk de di navbera du aliyan de radiweste: bijîşkên dilsoz ên ku girêdayî pîvanên pîşeyî û mirovî ne û ji bo bidestxistina hevsengiyek di navbera sûdên bijîşkî û rehetiya psîkolojîk a nexweş de dixebitin; yên din jî ji aliyê çavbirçîtîya bazirganî ve hatin birin, bi bikaranîna pêdiviyên mirovan an jî qelsiyên psîkolojîk, dayîna sozên derewîn, her wiha bê hebûna şert û mercên bijîşkî yên têrker van emeliyatan dikin ku di gelek rewşan de bû sedema tevliheviyên cidî yên tenduristî û psîkolojîk.

**Her kes li pey jiyan û wêneya bê kêmasî dibeze**

Bîlançoyên cîhanî nîşan didin ku jin rêjeya herî mezin a kesên ku li niştерkariyên xweşikbûnê digerin, çi neştergerî bin çi ne neştergerî bin, wek Botox û derzîyên dagirtinê. Ev niştерkarî her wiha zêdebûneke girîng a salane tomar dikin ku ev yek daxwaza zêde ya ji bo wan nîşan dide, ne tenê ji ber sedemên bijîşkî, lê di heman demê de ji bo tenê armancên estetîkiya fîzîkî.

Pispor vê zêdebûnê rasterast bi bandora medyaya civakî ve girê didin ku vê blatformê wêneyek di serê her ciwan û însanekê/î de avakir ku divê bi awayekê herî xweşik derkeve pêş û xwe weke însanê bê kêmasî nîşan bide, helbet rastiya pêkanîna vê yekê jî ne mumkine. Bi belavbûna felterên li ser medya û bernameyên dijîtalê re, ferqkirin û jihevderxistina ji wêneya rast û ya ku ne rast û heqîqî ye, gelek zehmet bûye. Ev yek jî gelek jinan neçar kiriye ku ji bo bidestxistina wê wêneya bê kêmasî, serî li niştерkariyên xweşikbûn bidin. Helbet ev jî yek ji rêbazên Şerê Taybet û bikaranîna wê li ser jinan bi taybet weke ku me aniye ziman e. didome…



# Girîngiya stratejîk a Tengava Hurmizê di cîhanê de

Di naveresta Kendava Erebî de Tengava Hurmizê wekî yek ji girîngtirîn rêyên deryayî yên veguhestinê di cîhanê de tê nasîn. Rêjeyeke mezin ku bi qasî çareyeke bazirganiya petrol û gaza xwezayî ya cîhanê di vê tengavê re derbas dibin.

Navenda Nûçeyan

Tengava Hurmizê rêyeke deryayî ye ku li ser asta navdewletî û herêmî xwedî girîngiyeke îstratîjîk e. Herwiha ew xaleke sereke ya derbasbûnê di nava yek ji girîngtirîn dergehên navîgasyona li cîhanê ye di heman demê de wekî damara bingehîn a bazirganiya navneteweyî temsîl dike. Di tenvagê de derdora ji sedî 11 bazrganiya cîhanê li wir derbas dibe.

Rola tengavê ne tenê bi rêya navîgasyonê ve sînordar e, lê di dîrokê de bi nakokiyên mezin ên li herêmê ve girêdayî ye û ji salên 1980'an û vir ve ew bûye qadeke ku berjewendî û nakokiyên herêmî û navneteweyî lê digihîjin hev.

**Cih û erdnîgariya Tengava Hurmizê**

Tengav Hurmizê, Kendava Erebî ji Kendava Omanê vediqetîne. Li bakurê wê Îranê ye, li başûr jî parêzgeha Mesendem a Omanê ye. Tengav cihê stratejîk e ku welatên Kendavê û avên navneteweyî bi hev ve girê dide.

Tengava Hurmizê li rojhilatê Kendava Erebî û bakur-rojavayê Kendava Omanê ye, ku bi hev re du kanalên deryayî yên ku bi Okyanûsa Hindî ve girêdayî ne pêk tînin.

Tengava Hurmizê ji aliyê bakur û rojhilat bi Îranê ve û ji başûr bi Omanê ve ku çavdêriya trafîka deryayî di nav ava xwe ya herêmî de dike, tê sînordarkirin.

Peravên wê yên bakur ji beşên ji rojhilatê giravên Qeşm û Larak ên Îranê pêk tên. Li peravên wê yên başûr jî Nîvgirava Musendam a Omaniyê hene. Gelek girav li ser tengavê belav bûne. Ji wan Qeşm, Hurmuz, Larak û Hengam girêdayî Îranê ne û giravên Selame û Xenem, Nîvgirava Musendam girêdayî Omanê ne. Giravên Teneb a Mezin, Teneb a Biçûk, Ebû Mûsa û girava Farur a Îranê li deriyê bakur ê tengavê ne.

Peravên wê yê başûr-rojhilat ji Ras Diba li peravên Îmaratên Yekbûyî yên Erebî heta Damajah li peravên Îranê dirêj dibe. Ev xet tengavê ji Kendava Omanê vediqetîne.

Dirêjahiya Tengava Hurmizê bi qasî 161-167 kîlometreyan e. Firehbûna wê jî di navbera 33- 95 kîlometreyan e. Tengav ji 2 rêyên sereke yên navgînasyonê; Yek ji bo keştiyên ku dikevin kendavê û ya din jî ji bo keştiyên ku derdikevin Kendava Omanê, pêk tê. Her rêyek bi qasî 3 kîlometreyan e. Di navbera wan de herêmeke tampon ji bo ewlehiyê heye.

**Girîngiya Tengava Hurmizê a Aborî**

Girîngiya tengavê a aborî ji ber ku ew dergeheke herî girîng a deryayî ji bo veguhestina petrolê di cîhanê de ye. Piraniya hinardekirina petrola ji dewletên Kendava Erebî berî ku bighêje bazarên cîhanî di tengavê de derbas dibe. Rêjeya herî mezin a hinardekirina petrolê ji Erebistana Siûdî, Îmarata, Kiwêt, Îraq û Qeterê ye.

Welatên mîna Îran ji sedî 90 ji hinardekirina petrola xwe dispêre Tengava Hurmizê. Kiwêt û Iraq, ji ber nebûna alternatîfên guncaw, ji bo hinardekirina petrola xav û berhemên wê bi tevahî xwe dispêrin Tengava Hurmuzê. Her çendî ku li Erebistana Siûdî û Îmarat rêyên hinardekirinê yên alternatîf hene jî, lê bi giranî xwe dispêrin Hurmizê. Siûdî ji sedî bi qasî 40 petrola xwe ji Hurmizê hinarde dike û Îmaratê jî bi qasî ji sedî 18 e.

Li gorî texmînan rojane nêzîkî 20 milyon bermîl petrol û berhemên wê di tengavê de derbas dibe, ev yek nêzîkî ji sedî 20 ji xeckirina cîhanî a petrolê pêk tîne, ev nîşan dide ku aboriya cîhanî çiqasî bi aramiya navîgasyonê di vê dergeha girîng de girêdayî ye.

Çînê ku herî zêde xwe dispêre petrola Tengava Hurmizê, ji sedî nêzî 32 ji tevahiya hinardekirina wê pêk tîne. Piştî wê Hindistan ji sedî 18, Koreya Başûr ji sedî 13 û Japonya ji sedî 9 xwe dispêre tengavê.

**Rola tengavê di bazirganiya Gazê**

Ji bilî petrolê, tengav roleke girîng di bazirganiya gaza xwezayî de dilîze. Mîna dewleta Qeterê ku yek ji mezntirîn çavkaniyên gaza xwezayî ye û bi awayekî sereke ji bo hinardekirina gazê bo cîhanê, bi taybet li Asiya û Ewropa, xwe dispêre vê dergehê.

**Tengav di sedsala 20'an de bû qadeke şer**

Piştî keşfkirina petrolê li tengava Hurmuzê di destpêka sedsala 20'an de girîngiya wê zêdetir bû û bû xaleke girîng ji bo pevçûnên siyasî û leşkerî. Tê de gelek pevçûnên leşkerî de çêbû nemaze Şerê Îran-Iraqê (1980-1988) de.

Di sala 1984'an de piştî ku cihên petrolê û tankeran ên li girava Xarik ya Îranê hatin hedefkirin "Şerê Tankeran" dest pê kir. Tehranê bersiva êrişan da, tankerên ku ber bi Kiwêt û welatên din ên Kendavê ve diçûn kirin hedef û mayînên deryayî bi cih kirin. Di heman demê de Iraqê bi mûşekan êrişî tankerên Îranê kir.

Ev pevçûn hişt ku dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û welatên Ewropayê ji bo parastina navgînasyonê destwerdan bikin. Di havîna 1987'an de keştiyên Kiwêtê li mayînên Îranê qelibîn. Ji ber vê yekê Washington hebûna xwe ya leşkerî li herêmê xurtir kir.

Di îlona heman salê de helîkopeterên Amerîkayê êrişî keştiyên Îranê yên mayîn bi cih dikirin, kir û keştî binav kirin. Piştî ku keştiyên Amerîka û yên din li mayînan qelibîn, hêzên Amerîkayê baregehên Pasdarên Îranê rûxandin û êrişî keştiyek şer a Îranê kir.

Di Nîsana 1988'an de, DYA'yê operasyoneke leşkerî ya bi navê "Praying Mantis" pêk anî. Di encamê de keştiyên şer ên Îranê hatin rûxandin û qaîdeyên petrolê hatin bêbandorkirin. Her wiha zêdetirî 50 îranî hatin kuştin. Di şer de helîkoptera DYA'yê rûxiya û 2 pîlot mirin.

Di heman salê de, keştiya kruvazî ya USS Vincennes a Amerîkayê, balafireke rêwiyan a Airbus a Îranê bi gumana ku ew balafireke sivîl e xist xwarê û 290 kes kuştin.



**Bandora girtina tengavê li ser bazara cîhanî**

Her rageşiyeke siyasî an leşkerî li Kendavê bi gelemperî bandorek rasterast li ser bihayên petrolê dike. Gelek caran, biha di cih de, piştî zêdebûna rageşiyê ji ber tirsa qutbûna dabînkirinê bilind dibin. Lêçûnên dabînkirin û barkirinê jî zêde dibin, ji ber ku kampaniyên dabînkirinê di demên aloziyê de tiştek ku wekî rîska şer tê zanîn li ser keştiyên ku di tengavê re derbas dibin, ferz dikin, ku ev jî lêçûna veguhastina petrol û kelûpelan zêde dike.

**Bandora tengavê li ser Asiya**

Bandora Tengava Hurmizê ji welatên hilberîner ên enerjiyê wêdetir ber bi welatên sereke yên xercker, bi taybetî li Asyayê ve dirêj dibe. Aboriyên wekî Çîn, Hindistan, Japonya û Koreya Başûr bi giranî xwe dispêrin petrola Kendava Erebî. Li gorî daneyan nîşan didin ku bi qasî ji sedî 80'ê petrola ku di tengavê re derbas dibe, ji bo bazarên Asyayî tê şandin, ev yek jî aramiya navîgasyonê di vê rêya avê de ji bo ewlehiya enerjiyê ya van welatan girîng dike.

**Girîngiya Tengavê bo welatên Kendavê**

Ji bo welatên Kendava Erebî, tengav damareke aborî ya girîng ji bo aboriyên wan ên neteweyî temsîl dike, ji ber ku budceyên wan bi giranî bi dahata petrol û gazê ve girêdayî ne, ev yek jî berdewamiya herikîna van çavkaniyan bi rêya tengavê girîng dike.

**Rageşiyên jeopolîtîk**

Di salên dawî de çend aloziyên jeopolîtîk çêbûne ku jinûve balkişandin ser girîngiya Tengava Hurmizê, ji ber ku pevçûnên herêmî bi gelemperî dibin sedema guherînên di bihayên petrolê de. Her astengiyeke dirêj a veguhastinê dikare bibe sedema kêmbûna dabînkirina petrolê û bilindbûneke girîng a bihayê.

**Ferzikirina dorpêçê li ser tengavê**

Piştî zêdeyî mehekê li ser şerê Amerîka-Îsraîlê li dijî Îranê, di gaveke bêhempa de Washingtonê ragihand ew ê dorpêçeke deryayî li ser hemû keşteyên ber bi benderên Îranê û ji wan, tevî keşteyên navneteweyî, daniye. Dorpêç ji 13'ê Nîsanê ve ji saet 10'ê sibehê ve destpê dike.

Ev dorpêç li ser bingeha daxuyaniyek ji aliyê Serokê Amerîkayê Donald Trump ve pêk tê, li gorî daxuyaniyê dorpêç li ser trafîka deryayî ya ji benderên Îranê û ji wan pêk were, ye. Daxuyaniyê zelal kir ku dorpêç ji bo keşteyên ji hemî welatan ên ku dikevin bender û deverên peravê yên Îranê an jî derdikevin, di nav de benderên Îranê yên li Kendava Faris û Kendava Omanê, derbasdar be.

Di bersivê de, Tehran bi rêya Pasdarên Şoreşê, ragihand ku Tengava Hurmiz di bin kontrol û rêveberiya hişk de ye, ku navîgasyona sivîl dê li gorî rêziknameyan berdewam bike, di heman demê de ji bo hebûneke leşkerî ya dijmin dê bi tundî bersiv bê dayîn.

# Şikestinek li Rojhilata Navîn, cûdabûna rê li Rojava

**Hasan Agaç**

Rojhilata Navîn ji nû ve, tê têşe kirin. Her çend nakokîyên ku di navbera Îsraîl û Îranê de gûmanên veguhertina şerekî herêmî diparêzin jî, rêyên danûstandinê vekirî dimînin. Hevdîtinên dawî yên di navbera DYA û Îranê de, bi navbeynkariya Pakistanê, nîşana serdemeke nû ne ku şer û danûstandin bi hev ve girêdayî tê meşandin. Ev wêne nîşan dide ku Rojhilata Navîn ne tenê ji nexşerêyekê leşkerî lê di heman demê de ji nû ve avakirineke siyasî jî derbas dibe. Di vê pêvajoyê de, amûra diyarker ne tenê pevçûna navbera dewletan e. Amûra diyarker a rastîn ev e ku kîjan modela civakî û siyasî dê di valahiya desthilatdariyê ya derketî de bihêz bibe. Di vê xalê de ye ku Kurd careke din xwe di navenda dîrokê de dibînin. Lê, vê carê pirsgirêk ne tenê hebûn e; xala girîng ew e ku jiyanek çawa dê were avakirin. Azadî êdî ne tenê mijara berxwedanê ye, di heman demê de jî ya avakirinê ye. Ji ber ku her çend azadî were bidestxistin jî, ger jiyanek azad neyê avakirin, destkeftî dê di nav pergala kevin de zû bihelin.

Ji ber vê yekê, îro pirgsgrêka herî girîng li Rojava ev e ku mirov çawa azadiyê mayînde bike.

Di vî warî de, banga civaka demokratîk a ku ji hêla Reber Apo ve hatî pêşkêş kirin ne tenê çarçoveyek teorîk e, lê di heman demê de nexşerêyek jîyanê ye jî. Ji vê bangê ve, azadî ne bi avakirina dewletê, lê bi xwerêxistinkirina civakê gengaz e. Komun, rizgariya jinan û siyaseta demokratîk stûnên bingehîn ên vê ramanê ne. Jiyanek azad li ser vê bingehê tê avakirin. Ezmûna Rojava di vî warî de xwedî girîngiyeke dîrokî ye. Rojava ne tenê qadeke erdnîgarî ye; ew pêvajoyeke berbiçav a avakirina civaka demokratîk e. Komun, bi rêvebirina jinan û avahiyeke civakî ya pir nasnameyî nîşan dana ku şêwazek jiyaneke gengaz li Rojhilata Navîn mîsoger e. Lê, di vê qonaxê de, Rojava jî bi metirsîyekê xeter re rû bi rû ye. Guftûgoyên entegrasyonê yên bi Şamê re di bingeha wê mijarê de ne. Rewşa ku derdikeve holê ne tenê pêvajoyeke sererastkirina rêveberiyê ye. Ev mijara parastina destkeftiyan û veguherandina wan bo statuyek nû ye, an jî hilweşandina ezmûna heyî ya rêxistinkirî di nav avahiyên hikûmetê de ye. Geşedanên li ser erdê bi zelalî girîngiya vê pêvajoyê eşkere dikin. Lawazbûna saziyan û nezelaliyên di derbarê rêbaza entegrasyonê de ji bo pêşeroja ezmûna heyî naveroka pirsan didin xauya kirin. Lê, ev pêvajo parastina ezmûna civaka demokratîk û veguheztina wê bo jêrzemînek siyasî ya nû hewce dike. Ji aliyekî din ve, avahîsaziya li Şamê ne dewleteke damezrandî ye, lê pergaleke dabeşkirî ye ku hîn jî di pêvajoya avakirinê de ye. Ev ne qelsiyek ji bo Rojava ye, lê belê derfetek e. Ji ber ku ev pêvajo ne li ser tevlîkirina bi dewleteke heyî re ye; Ev pêvajoyek e ku mirov beşdarî çawaniya avakirina Sûriyekê nû bibe. Ezmûna 14 salan a Rojava ne tenê mîrateyek e ku were parastin, lê di heman demê de modelek nû ye jî. Geşedanên roja me ya îro, yên li ser erdê bi zelalî vê pirsgirêkê eşkere dikin. Her çend veguheztina girtiyan, danûstandinên di asta herêmî de û diyalogên di navbera eşîran de hevgirtinekê civakî ya nû diafirînin jî, nîqaşên li ser nasname, statû û nûnertiya deskeftiyan pêvajoyê nîşan didin. Heta rageşiyên li ser mijarên bingehîn ên wekî tomarkirina nifûsa Kurdan jî eşkere dikin ku mijar ne tenê teknîkî ye, lê rasterast siyasî ye. Li Rojhilata Navîn bi tevahî, şer û dîplomasî bi hev ve girêdayî ne. Helwesta tund a berdewam a Îsraîlê li dijî Îranê, digel zexta DYA ya li ser rêyên danûstandinê, nîşan dide ku plansaziyekê dualî di aloziyên herêmî de tê dîtin. Ev rewş hem ji bo Kurdan xetere û hem jî derfetan pêşkêş dike, wekî ku ji bo hemî serkeşên li herêmê dike. Di vê xalê de,mijara girîng ew e ku dê li ser kîjan xetê israr were kirin. Wekî ku Reber Apo teqez kir, çareserî ne di avahiyên dewletê de ye, lê di avakirina civakek demokratîk de ye. Ev tenê bi civatek rêxistinkirî û hişmend a ku dikare jiyana xwe ava bike gengaz e. Di vê mijarê de, pirsa bingehîn a ku Rojava pê re rû bi rû ye zelal e: Gelo ew ê bibe avahiyek ku di nav hevsengiyên heyî de were entegrekirin, an jî ew ê bibe hêzek damezrîner ji bo modelek jiyanek demokratîk a nû? Bersiva vê pirsê dê ne tenê pêşeroja Rojava, lê ya tevahiya Rojhilata Navîn diyar bike.



Gulîstan Xalid

## Entegrasyon di Pêvajoya Şoreşa Demokratîk de: Dînamîkek ku Têkoşînê Kûrtir Dike

Şoreşa demokratîk ne tenê guhertina desthilatdariyê an di wateya klasîk de veguherîna dewletê ye. Di bingeh de, ew pêşxistina kapasîteya civakê ji bo xwerêveberiyê, rêxistina wê û ji nû ve avakirina wê li ser bingeha hişmendiya demokratîk e. Di vê çarçoveyê de, entegrasyon ne qelskirina pêvajoya şoreşê ye; dema ku bi rêkûpêk were birêvebirin, ew dibe yek ji amûrên berfirehkirin û kûrkirina wê. Pergala dewlet netew xwedî meyla ku civakê homojen bike, cûdahiyan tepeser bike û avahiyek navendî ava bike. Feraseta neteweya demokratîk jî, hevjiyana azad a nasname, çand û beşên civakê yên cûda esas digre. Têkoşîna di navbera van her du paradîgmayan de yek ji nakokiyên siyasî yên herî bingehîn ên serdema me ye.
Lêbelê, ev nakokî ne hewce ye ku her dem wekî qutbûnek mutleq xuya bibe. Bi qasî ku hêzên şoreşa demokratîk civakê li ser bingehek demokratîk birêxistin bikin, ewê bikarin têkiliya entegrasyonê bi dewletê re ji bo berjewendiya xwe veguherînin. Di vê rewşê de, entegrasyon ne teslîmbûn e, lê dibe gavek taktîkî û stratejîk ku têkoşînê ber bi bingehek berfirehtir ve dibe.
Entegrasyon li vir divê ne wekî tevlihevkirina du pergalên cûda, lê wekî hebûna civakek demokratîk di nav avahiya dewletê de ku xweseriya xwe diparêze were fêm kirin. Ger civak rêxistinbûna xwe, mekanîzmayên xwerêveberiyê û hişmendiya kolektîf biparêze, entegrasyon van avahiyan qels nake; berevajî vê, ew wan bêtir xuya û bibandor dike.
Pirsa girîng li vir ew e ku hêz li ku ye. Ger civatek rêxistinkirî xurt be, têkiliya wê bi dewletê re wê ji holê ranake. Berevajî vê, ew ê di avahiyên hişk ên dewletê de şikestinan çêbike û demokratîkbûnê ferz bike. Ev yek berdewamiya şoreşa demokratîk misoger dike.
Garantiya herî bingehîn a civatek demokratîk a ku bi dewletê re di nav entegrasyonê de dijî ev e ku ew bi berdewamî xwerêxistinkirina xwe zindî dihêle. Ev rêxistin bi rêya çend prensîbên bingehîn pêş dikeve: Beşdariya rasterast a gel di pêvajoyên biryardanê de bi rêya meclisên tax, gund û bajaran. Avakirina rêxistinên kolektîf di her warî de, ji aboriyê bigire heta perwerdeyê, ji ewlehiyê bigire heta çandê.
Jin bi rêya rêxistinên cuda û xweser dibin pêşeng di vê pêvajoyê de. Nasname û baweriyên cûda bi xweserbûna xwe, xwe îfade bikin. Civak dikare xwe hem ji hêla civakî ve û hem jî ji hêla siyasî ve biparêze. Ev rêbazana rê li ber girêdana civaka demokratîk bi dewletê ve girêdayî digre. Berevajî vê, ew dihêle ku ew têkiliya xwe bi dewletê re li ser hêza xwe ya rêxistinkirî ava bike.
Di şert û mercên ku entegrasyon bi awayekî rast were sazkirin de, derfetên nû ji bo hêzên şoreşa demokratîk derdikevin holê. Ev derfet ev in: Belavkirina nirxên demokratîk ji bo girseyên berfirehtir. Bikaranîna qadên qanûnî û siyasî ji bo têkoşînê. Zêdebûna rewatiya civakî. Xurtkirina dînamîkên veguherînê di nav dewletê de. Ev nîşan dide ku entegrasyon ne pêvajoyek pasîf e; ew qadeke têkoşînê ya çalak e.
Şoreşa demokratîk pêvajoyeke veguherîna civakî ye ku berdewamiyê hewce dike. Di vê pêvajoyê de, entegrasyon, dema ku li ser bingehek rast were nêzîk kirin, ji bo şoreşê ne astengiyeke; ew amûrek e ku wê xurt dike. Faktora diyarker a rastîn rêxistina civakê bi xwe û hişmendiya demokratîk e.

# Şoreşa Rojava bi berxwedana jinên qehreman û çeleng hat mohrkirin

**Asya Weşûkanî**

Ger ku em weke jin û weke civak têkoşîn û kar, xebat û berxwedan û fedakariya jinên çeleng bigirin dest û binirxînin; wê demê wê hîn baştir rola Yekîneyên Parastina Jin YPJ'ê, derkeve holê bêka wan jinên qehreman û çeleng berxwedanî û şerekî çawa raber kirine. Di serî de gerek jin, ciwan û hemû civak xwedî agahiyên dîrokî bin û gerek, demboriya xwe weke netew biberfirehî lêkolîn bikin û ferqa dîroka xwe ya; civakî beriya 53'ê salan û ya îro bibîne û bide berhev ji bo ku rastiyên wê demê dihatin jiyankirin bibînin. Rêber Apo beriya 53'ê salan Kurdê mirî keşif kir û sozda ku wê Kurdê bêruh careke din zindî bike û bi têkoşîn û xebateke berdewamî; soza xwe pêkanî û gelê Kurd zindî kir û anî rewşa ku bibe yê xwe û vîna xwe temsîl bike û ji hemû cîhanê re da nîşandan ku Kurd hatiye guhertin û veguhertin.
Rêber Apo li ser mîrateya sosyalizma pêkhatî û têkoşîna jinên, Femînîst pirosa jinên Kurd ên welatparêz destpê kir û tevgera; jinên azadî xwaz birêxsitin kir gav bigav meşand û kire xwedî, ezmûn û bîrdûzî û jin jî bûn xwedî bîr û bawerî û roj bi roj pêşketin. Ew jinên Kurd ên ku her dihatin çewisandin û bawerî bi wan, qet ne dihat ku wan tenê bişînin ber derê malê vê carê jî dinava gel de; xebat kirin û derketin ser çiyan û weke mêran çek hilgirtin û bûn, gerîla û hemû nerîn û tewriyên berê dinava civakê de vala derxistin. Û bi demê re jinên ku hejmara wan dinava Partiya Karkirên Kurdistanê de, li ser tiliyan dihate hijemartin roj bi roj zêdetir dibû; heta ku hejmara xwe gihaşte yekîneyan û fermandarên xwe jî çêbûn û têkoşîn û qehremaniya, wan dinava şer de hurmet û qedirbilindî da qezenc kirin. Tişta ku ez dixwazim balê bikişînim ser jî ewe ku jinên, Kurd hema wiha bi hesanî ciyê xwe dinava Partiya Karkerên Kurdistanê PKK ê de; girtin û hema wiha bêyî tu zor û zehmetîyan gavên wiha xurt avêtin û bûn artêş û partî! Tekez ger ku em wiha nêzîkatî raber bikin wê demê, nezanî û xerîbiyeke pir mezin ya Kurdan ji rastiya wan ya; civakî heye û gerek careke din em weke milet xususiyatên xwe yên civakî, diber çavan re derbas bikin û paşverûtiya xwe ya kûr bibînin; di heman demê de wê sebra mezin ya Rêber Apo û têkoşîna Wî ya bêhempa û rawestan, wê were famkirinû wê xwedî li wê têkoşînê were derketin. Û li kêleka ked, kar û xebata Rêber Apo ya ku ji tunebûnê hebûn çêkir û jina ku; dinava çar dîwaran de hatibû ye dîlgirtin derxiste ser çiyan û çekê, rumetê da destê wan ji bo ku xwe û welatê xwe pêbiparêzin.
Jinên Kurd jî weke jinên resen ên Dêrsim, Botan, Amed û Gerzanê xwedî li keda Rêber Apo derketin û sozdan Rêbertî, şehîdan, gel û jinên çalak ên 8 ê Adarê û 25 ê Mijdarê û roj bi roj; dinava wan çiyayan de weke gulên berfînê çalak bûn û baweriya, xwe bi xwe anîn û gelek ji wan jî bi qehremanî di eniyên şer de rola xwe leyîstin. Û weke Bêrîvan Îgab, Besê, Ezîme, Edalet, Zeyneb, Bêrîtan, Zîlan, Sema, Rojbîn Ereb û Viyanan; çalak bûn û navê xwe bi tîpên zêrîn li rupelên, dîrokê xêzkirin û bûn pêşeng û serkêş. Û roj bi roj artêşa jinan mezin bû û nav û dengê xwe li tevahî, perçên Kurdistanê belav bû heyanî ku bandora xwe li Ewropa jî kir û gelek; jinên biheybet û qedirbilind ji Kurdên li Ewropa jî beşdarî nava, refên gerîla bûn û bi dilêrî û qehremanî şer kirin û gihaştin şehadetê.
Kar, xebat û têkoşîna jinên Kurd ên çeleng bandora xwe, li jinên iyanî jî kir û gelek jinên entirnasyonalîst jî beşdarî nava tevgera; azadiya jinên Kurd bûn û gelek ji wan jinên pêşeng û serkêş jî gihaştin, şehadetê û bandora xwe li ser hemû jinên cîhanê jî kirin. Û bandora pêşveçûna jinên çiyayî û qehremaniya wan têna xwe da hemû jinên Kurd, li Rojava, Başûr û Rojhilat jî û bi têkoşîna gelê Kurd li Rojava û piştî; serhildana bajarê Qamişlo û binyad kirina partiya PYD ê li Rojava jinan jî xwe, dinava civakê de weke tenzîmat birêxistin kirin. Û di destpê kirina têkoşîna YPG ê li dijî pergala partiya Baas; jinan jî xwe weke Yekîneyên Parastina Jin birêxistin kirin û di sere, li dijberî tundrewiya DAÎŞ ê rola jinan hîn zêdetir derkete pêşde û jinan, bi wêrekî li dijî çeteyan şer kirin.
Ew çeteyên ku mêr ji ber wan direviyan jinên weke Arîn Mîrkan û Rêvan Kobanê; xwe dinava wan de teqandin û derbên giran li wan dan. Û weke ku tê zanîn 14 sale ku YPJ ê têkoşîn dike û bi dehan, şehîd û qehremanên xwe hene. Şoreşa Rojava bi berxwedana jinên qehreman û çeleng hat mohrkirin û gihaşte serkeftinê û qet hesan nine ku berxwedan, têkoşîn û dilêriya wan şêre jinên fedayî were jibîrve kirin yan jî ji nedîtîve; were temaşe kirin û em hemû jinên Kurdistanî em qebul nakin ku, azadiya jinan were biştguh kirin yan jî weke welatên Soveyytan piştî, şer jin vegerin mala xwe û koledariya xwe berdewam bikin. Weke jinên Kurd û nexasim jî weke jinên Rojavayê Kurdistanê tekez emê desturê nedin, ku careke din keda jinan hedir biçe û careke din jin vegere weke; serdema fewdaltî û paşverûtiyê û em di azadî û demokrasiyê de îsrar dikin, ji xwe gerek were zanîn ku ger azadiya jinê nebe azadiya, civakê jî nabe û wê her têkoşîn berdewam bike. Em weke hemû jinên Rojava dixwazin ku berhema ked û têkoşîna xwe ya 14 salan, azadiya xwe weke zayend û azadiya civakê pêk bînin, hişmendiya mêrsalar têk bibin û welatê xwe bigihînin asta ronesansê.



# Piştî 60 salan mafê welatîbûnê yê Kurdên Sûriyê vedigere

Doza kesên neqeydkirî (mektûm) yek ji dozên herî aloz di Sûriyê de ye, niha piştî 60 salan ji bêparbûna ji mafê welatîbûnê, hêvî vedgere.

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Doza kesên neqeydkirî(mektûm) yek ji dozên herî aloz di dîroka Sûriyê ya nûje de ye, têgeha wateyê ji kesên ku li ser xaka Sûriyê dijî, lê di qeydên dewletê yên fermî de nehatine tomar kirin, ev dihêle ku hebûna wan di aliyê qanûnî de tune dike û ji mafê hemwelatîbûnê bêpar dimînin wekî perwede, çûn û heatin, kar û kirîna mal û milkan.

### Dîroka pirsgirêkê

Koka vê krîzê vedigere serjimêriya ku di 5'ê Cotmeha 1962'an de li parêzgeha Hesekê, li gorî Fermana Qanûnî ya Hejmar 93'an hate kirin, ku tenê di rojekê de bi armanca pejirandina nifûsa rewa, hate pêkanên.
Ev serjimêrî bû sedema dabeşkirina Kurdên li Sûriyê di sê kategoriyên sereke de.
Welatiyên Sûrî: Ew kesên ku karîbûn îsbat bikin ku berî sala 1945'an li Sûriyê dijîn.
Biyaniyên Hesekê: Ew kesên ku nekarîbûn li gorî mercan belgeyên fermî yên hewcedar nîşan bidin, ji hemwelatîbûnê hatin bêparkirin û kartên sor ji wan re hatin dayîn û rewşa wan a yasayî bû rewşa biyaniyan.
Kesên neqeydkirî (mektûm): Kesên ku di tomarên serjimêriyê de behsa wan nehatiye kirin, an jî ji bavekî ji kategoriya "biyanî" û dayikekî "neqeydkirî" an "biyanî" çêbûne û nehatine qeydkirin, ji ber vê yekê bê belgeyên fermî mane.
Ev katagorî ya herî zêde hatibû paşguhkirin, ji ber ku ew ji hêla qanûnî ve ne wekî biyanî, ne jî wekî welatî dihatin nasîn û mafên wan ên bingehîn bi dehsalan ve tune bûn.
Bi dehansalan e, kesên mektûm di rewşek bêwelatiyê de dijîn û bandoreke mezin li ser jiyana wan a rojane kiriye herwiha asta wan a jiyanî giran kiriye.
Ji van bandoran a herî berbiçav bêparbûna ji mafê perwerdeyê û nikarîna bidestxistina şehadeyên akademîk ên fermî an jî qeydkirina li zanîngehan bû, ku derfetên wan ên ji bo pêşketina pîşeyî û civakî asteng dikir. Ev êş û azar bi şert û mercên şer piştî kirîza Sûriyê di sala 2011'an de zêde bûn.

### Fermana Esed ji bo welatîbûnê

Li gorî rêxistina "Sûriyên ji bo Rastî û Dadmendiyê", hejmara kesên mektûm li Hesekê heta sala 2011'an gihaşt zêdetirî 171 hezar û 300 kesan, nêzîkî 50 hezar û 400 ji wan heta sala 2018'an hemwelatîbûn wergirtin, piştî ku rewşa xwe ya yasayî ji kategoriya mektûm bo kategoriya biyaniyan û piştre re bo kategoriya welatiyên Sûriyê, guhertin. Lê dîsa jî nêzî 41 hezar kes ji wan nikarîbûn rewşa xwe biguherînin ji ber pirsgirêkên ku li hember mûdîriyeta nifûsê derket, dema ku dosyayên wan di kategoriya biyaniyên Hesekê de tomar dikirin. Di heman demê de 5000 hezar ji wan serî nedan mûdîriyetê ji bo sererastkirina rewşa wan a qanûnî. Di sala 2018'an de piraniya biyaniyên Hesekê welatîbûn wergirtin hejara wan gihaşt 326 hezar û 489 ji eslê 346 hezar û 242 kesan, li gorî heman çavkaniyê.
Di sala 2011'an de, rejîma Baas'ê bi serokatiya Beşar El-Esed Fermana Hejmar 49'an derxist, tê de hemwelatîbûna Sûriyê da kategoriya biyaniyên Hesekê, lê kategoriya kesên mektûm jê dûr xist, ji ber ku ew neçar kirin ku pêşî rewşa xwe rast bikin da ku bibin biyanî berî ku bikaribin daxwazên hemwelatîbûnê bikin, ev yek jî pêvajoyek tevlihev e ku gihaştina wan a mafên wan aloz kir.
Ev pirsgirêk di dirêjahiya kirîza Sûriyê de berdewam kir, di encamê de pirsgirêka vê katagoriyê berfirehtir kir, ji ber windabûna belgeyan di dema koçberiya bi darê zorê de.

### Madeya 13'an ji bo wergirtina hemwelatîbûnê



Xaliya Ibêd Keleş



Nisrîn Yûsif Îbrahîm

Serokê Hikûmeta Demkî ya Sûriyê, Ehmed El-Şaraa, Fermana Hejmar 13'an sala 2026'an derxist, tê de piştrast dike ku welatiyên Kurd ên Sûriyê parçeyeke bingehîn û resen a gelê Sûriyê ne û nasnameya wan a çandî û zimanî beşek yekgirtî ya nasnameya neteweyî ya Sûriyê ya cihêreng e. Armanca vê fermanê bidawîanîna êş û azara kesên bê qeyd bû ku ji zêdetirî 60 salî ve dom kiriye.
Lêbelê, di derbarê mekanîzmaya îsbatkirina hebûna kesên neqeydkirî yên ku tu belgeyên fermî nînin û çawaniya ji nû ve avakirina databasa sivîl li deverên ku tomar bi tevahî hatine wêrankirin de, pirsgirêkên lojîstîkî yên mezin derdikevin holê.
Niha li bajarên kantona Cizîrê navendên taybet hatine vekirin, da ku navên kesên mektûm werin tomarkirin. Welatî berê xwe didin van navendan da ku piştî 60 salî bighêjin belgeyên xwe yên fermî. Ji xwe proseya tomarkrinê ji bo wergirtina hemwelatîbûnê dê mehekê dirêj bibe, eger pêwsît bê dîtin dibe ku dirêjtir bike, da ku her kes karibe ji vê biryarê sûd bigre.

### Hêviyên wergirtina hemwelatîbûnê vedgere

Bi hezaran Kurd li Sûriyê ji mafên xwe yên bingehîn hatibûn bêparkirin. Ji ber ku nasnameyên wan tune bûn, wan nedikarî di saziyên fermî de kar bikin, di zanîngehan de bixwînin û di nava welat de bi azadî bigerin. Ev rewş bû sedem ku Kurd li ser axa xwe wekî biyanî û bêmaf bijîn. Derbarê vê yekê welatiya Kurd bi navê Xaliya Ibêd Keleş ji rojnameya me re anî ziman ku ew ji dema jidayîk bûye bê nasname ye û wiha got: "Ji ber ku bav û dayika min bê nasname bûn, em ji dema jidayîkbûnê bê nasname dijîn. Me gelek caran daxwazên hemwelatîbûnê kir, lê dihatin red kirin. Ji ber ku nasname û belgeyên me yên qanûnî tune bûn, çûn û hatina me jî dihat sînordarkirin di nava welêt de."
Xaliya Ibêd Keleş piştrast kir ku ew ji mafên kirîna mal û milan herwiha erebeyan bêpar bûn û wiha gotina xwe qedand: "Ligel vê yekê jî, me gelek zehmetî dî dîtina kar di nava sektorên Giştî an taybet de, didît, vê yekê bandor li ser jiyana me ya aborî jî dikir herwiha bandoreke mezin li ser zarokên me kir."
Welatiyeke din a ku ji nasnameyê hatibû bêparkirin, navê wê Nisrîn Yûsif Îbrahîm e diyar kir ku kesên mektûm gelek êş û azar dîtin ji ber nebûna nasnameyê û wiha dewam kir: "Ji ber derxistina gelek biryarên ku mafên me binpêdikir, kesên mektûm wekî me gelek êş di jiyanê de dîtin. Ez hêvî dikim ku qeydkirina kesên ku ji hemwelatîbûnê û nasnameyê bêpar bibûn berdewam bike heya her kes jê sûd bigrin. Me gelek êş kişand û ji gelek tiştan em bêpar man, ya herî hêsan nasname ye. Qeydkirina zarokên min pir dijwar bû ji ber ku qeyda min tunebû, lê hevjînê min xwedî nasname û hemwelatî ye. Tevî vê yekê me berxwe da û em bi koka û nasnameya xwe ya kurdî girêdayê man. Em ê nasnameyên xwe ya hemwelatîbûna Kurdî Sûrî werbigrin, bi vî rengî em ê werin nas kirin ku em hemwelatî û Kurd in.
Nisrîn Yûsif Îbrahîm wiha gotina xwe qedand: "Baweriya me bi projeya Rêveberiya Xweser li herêmê heye, ew projeyek serkeftî bû, ji ber ku tê de her welatiyek mafê xwe yê perwerde û pêkanîna rêûresmên xwe yên olî û civakî bi azadî bi dest xist. Îro em encama vê têkoşînê dibînin. Ger ne ji hêzên me û zarokên me bûya, me mafên xwe bi dest nedixist, ya herî hêsan jî mafê hemwelatîbûnê ye. Em hewldana ku ji bo me wekî gelê Kurd ê resen li Sûriyê hat dayîn teqdîr dikin."



# ‘Pêdiviya Kurdan bi yekhelwesta siyasî û avakirina kongreyeke neteweyî heye’

**Mamosteyê Zanîngeha Rojava Beşê Wêjeya Kurdî Beşîr Mele Newaf diyar kir ku yekîtiya Kurdan ne tenê daxwazeke, lê pêdiviyeke stratejîk e ku bêyî wê pêşketin û parastina berjewendiyên netewî ne mumkin e.**

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Derbarê girîngiya hevgirtin û yektîkiya Kurdan li ser asta Kurdistanê, mamosteyê Zanîngeha Rojava Beşê Wêjeya Kurdî Beşîr Mele Newaf bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:



**Hûn rewşa yekîtiya Kurdan li parçeyên Kurdistanê çawa dinirxînin û gelo di nav raya giştî ya Kurd de hişmendiya têrker li ser girîngiya yekîtiyê heye?**

Heger em pirsa yekîtiyê di kurahiya wê ya dîrokî de binirxînin, ji serdemên impiratorî û şarestaniyên ku çêbûne, tê dîtin ku hêmanên bingehîn ji bo pêşketin, guhertin, veguhertin û çareserkirina pirsên civakê bê yekîtî ne mimkûn in. Dîrok me hînî van rastiyan dike. Civakeke ku di aliyê xwe yê civakî û hişmendiya komî (bîra civakî) de yekrêzî hebe, dikare bi hêsanî aloziyên ku bi ser de tên, çareser bike. Di demên şeran de jî ev rastî xuyayî dibe. Mînakî di Şerê Cîhanê Duyemîn de, bi taybet li Almanya, welat hate dagirkirin û parçe bû. Lê ji ber ku bingeha bîra komî ya xurt hebû, di demekê kurt de careke din rabû ser piyan. Ji bo Kurdan jî, bi taybet miletekî ku gelek hatiye çewisandin, ev pirsgirêk girîngtir e. Ev milet, di serdemên ku diviyabû statuyek civakî û siyasî ava bike, nekarî vê yekê pêk bîne. Ji ber vê yekê bîra komî ya wî, gelek caran hatiye şewihandin û qelskirin. Dema ku bîra komî ya miletekî tê şewihandin, ew milet bi hêsanî tê dagirkirin, hem jî dijmin dikare li gorî daxwazên xwe hişmendiya wî biguherîne. Ji ber vê yekê ev zêdetirî sed salan, miletê Kurd vê êşa mezin dikişîne “qelsbûna yekrêziyê” ya ku bi rêya siyasetên dagirkeran hatiye armanckirin.

Di pêvajoya destpêkê de, di dema hilweşandina Împaratoriya Osmanî de, Bedîi Zeman Siîdê Nûrsîfê dibêje ku sê derdên bingehîn ên Kurdan hene: Derdê yekem hejarî, duyem nezanî û ya sêyem bêîtîfaqî (ne-yekrêzî) ye. Ev her 3 hêmana ji bo civakekê tewreya herî xerab e û ev dikarin bibin sedema ku civakeke zû bê dagirkirin. Lê ev pêvajoyên ku çêbûn gelek guherîn çêbûn. Serhildanên Kurdan derketin holê û bîra azadî û serxwebûnê hêdî hêdî mezin bû. Lê her çend ev şop hatibe avakirin jî, civaka Kurd di gelek waran de paşdemayî ma. Dema ku dinyayê pêşketinên mezin di warê aborî, civakî û çîn û tebeqatê de dît, rewşa Kurdan hîn jî di çarçoveya rêbazên kevnar ên wekî axa, beg û rolê olê de ma. Dîsa jî, em dikarin bibêjin ku di nîvê sedsala 20’an de Kurd careke din rabûn ser xwe. Hin guhertin di warê zanebûnê û civakî de çêbûn, hejarî jî hinekî kêm bû. Lê pirsgirêka herî girîng ku ew yekrêzîya neteweyî ye, heta roja îro jî bi temamî nehatiye çareserkirin û hîn jî lewaz e. Tevî ku zana, helbestvan û siyasetmedarên Kurdan girîngiyeke mezin didin yekrêziyê, lê di pratîkê de em dibînin ku gelek tevger û rêxistinên ku nûneretiya Kurdan dikin, di bin bandora ajendeyên derve de ne. Ev jî astengiyê li ber avakirina yekrêziyê çêdike. Bi taybetî, di tevgera Rizgariya Kurdistanê de, Rêber Apo yekem kes bû ku vê mijarê hisiya û bi awayekî xurt girîngiya vê mijarê nîşan da. Di salên 1980’an de wî bal kişand ser pêdiviya avakirina eniyeke neteweyî û yekrêziyeke giştî ya Kurdan. Li gorî wî, bêyî yekîtî û bêyî avakirina projeyeke siyasî ya hevbeş, wekî kongreyeke neteweyî, ne mumkine ku Kurdan guherînên bingehîn pêk bînin. Ji bo vê yekê, dema em pêvajoya niha bibînin, em dibînin ku civaka Kurd bi gelek gavan di aliyê pratîkîkirina yekrêziyê de li pêşiya tevgerên xwe yên siyasî ye. Bi taybetî, şikestina ku li Rojavayê Kurdistanê çêbû, derencamê planekî navneteweyî û kêmaniyên hundirîn ên di tevgerê de bûn. Ji bo vê yekê, girîngiya yekrêziyê ji bo Kurdan ji aliyê hemû kesan ve tê zanîn. Di şert û mercên îro de jî, pêdivî ye ku tevgerên siyasî bi kêmanî hinekî li xwe vegerin û qebûl bikin ku ne mumkine encamên programên xwe yên siyasî bidest bixin bêyî ku yekrêziyek di navbera wan de an jî li ser asta her çar parçeyên Kurdistanê were avakirin.

**Çi astengiyên herî berbiçav ên ku rê li ber yekîtiya Kurdan digirin hene û nakokiyên hizbî û îdeolojî heta çi radeyê di warê qelskirina helwesta Kurdan de, bûne xwedî rol?**

Tevgerên Kurdan ji xwe partiyên wan gelek in. Bi qasî ku ev partî di qonaxekê de, ji salên 60’î de, bîra neteweyî pêş xistin, di baweriya min de di aliyê civakî de jî jihevketineke tevna civakê jî lîstin. Li ser tiştên ne hêja û li ser kursiyan rawestan, vê yekê bi şêweyekî ji nêz ve bandora xwe li hişmendiya civakê kirin û civak ji hev dûr xistin. Dibe ku astengiyên mijarî û zatî hene. Lê ev astengî nabin bihane ku armanca partiyan û siyaseta ku civakê ji nêrekî zordarî, êş û azarê derbas bikin û ber bi nêrekî baştir û xweştir ve bibin. Lê mixabin, ev partî hîn jî di çarçoveya teqlîdên fikrên kevin de ma ne û partîperestî li pêş e. Lê divê em civakekê ava bikin û armanca me pêşketina civaka me be. Dema ku partîperestî li pêş dikeve, di baweriya min de ev tehlûkeya herî mezin e, ew birîna herî giran e ku îro tevgerên siyasî yên Kurdî jê êş dikin. Di pêvajoya dawiyê de guhertina li ser raya giştî ya cîhanê hat dîtin, sedema wê hevgirtina gelê Kurd bû. Ger ev hevgirtin çênebûya, dikaribû gelek bandorên mezin li Rojava û li Başûrê Kurdistanê çêbikra. Ji bo wê divê em vê yekê wekî ezmûneyekê bibînin. Hestên neteweyî yên Kurdan ku ji ber zordariya dijminan hatine armancgirtin, ne tenê li aliyê siyasî, lê herwiha rûmeta Kurdan jî hatîye birîndar kirin. Lewra divê Kurd bê cudahî û girêdayîbûna îdeolojiyan, bi hev re rabin.

**Rêberên siyasî divê çi rol di xurtkirina yekîtiyê de bilîzin?**

Ji xwe, heger partî bi rastî nûneriya çînên Kurdan bikin û armancên wan biparêzin, ya herî guncaw ew e ku ew bi fikirin ka em li aliyê rastî yên rewşên ku îro Kurdistan û cîhan tê de ne, di kîjan rewşê de ne. Dibe ku partiyên Kurdî di destpêkê de, dema ku programên xwe danîn, şert û mercên wê demê bi wan re hebûn. Wek nimûne, dema ku Partiya Karkerên Kurdistanê hate damezrandin, cîhan di bin bandora sosyalîzmê û sermayedariyê de bû. Li ser vê bingehê xwedêgiravî sosyalîst piştgirîya tevgerên neteweyî dikir. Wê demê Partiya Karkerên Kurdistanê serxwebûn û azadiya gelê Kurdistanê dixwest. Lê piştî hilweşîna Yekîtiya Sovyetê û têkçûna sosyalîzma avakirî, em dibînin ku rola kesayetiya Rêber Apo gelek girîng bû. Ew têgihişt ku ne mumkine em nexşeya herêmê biguherînin beyî ku em rewşê bnirxînin. Ji ber vê yekê, bernameyê partiyê hate guhertin. Di qonaxa duyemîn de, bi taybetî piştî kompolya li dijî Rêber Apo û pêvajoya Îmralî, şêwazekî nû yê hizirkirinê derket holê. Têgihiştina vê yekê ku cîhan îro bi şêwazekî cemserek bi destê hêzeke mezin wek Amerîka, tê rêvebirin, nîşan dide ku guhertina nexşeya herêmê ne tiştekî hêsan e. Tiştê ku îro em jiyan dikin, dibe ku sibe biguherin, lê şert û mercên heyî qebûlkirin divê. Ji ber vê yekê, têgihiştina dewletê li ser bingehên neteweyî ne her gav çareser e. Teoriya neteweya demokratîk bi taybet ji bo Kurdan ku di çar parçeyan de ne, rêyekî guncaw e. Ji ber vê yekê, modela neteweya demokratîk an jî entegreya demokratîk, rêyeke guncawtire.

**Bi nerîna we Ragihandina Kurdî rola xwe di nêzîkkirina partiyên cuda de pêk tîne?**

Ragihandin, dema ku navê wê hatiye kirin ku “desthilata çaremîn” e, ne bi şaşî hatiye gotin. Ji ber ku ji bo ku tu karibe desthilatdariyekê an jî hikûmekî li aliyê civakê bike û wê bide qebûlkirin, ragihandin pêdivî ye. Ragihandin rolekî gelek mezin heye di pêşxistina hizrê civakê de. Di vî alî de dibe ku ragihandina Kurdî di aliyê teknîkî de pêşketinên wê kêm be, em gelek caran şêwazên desthilatdaran teqlîd dikin. Ev jî ji ber ragihandinên dewletên derdora me ye, yên ku em di bin desthilatdariya wan de ne, ew ragihandinê bi şêweyekî seqet bikar tînin. Dêvla ku ragihandin bibe azîne û wesîleya ku tu karibe civakê ji rewşekî xirab ber bi rewşekî baş ve bibe, tiştên nepenî û veşartî eşkere bike ku bibêje ya rast di vir de ye. Lê ev dewlet berovajî vê yekê dikin, tiştên baş û girîng ji civakê vedişêrin, tenê ji bo berjewendiyên xwe xîtabekî li gorî xwe dixin nav civakê. Ji ber vê yekê, li gorî baweriya min, ragihandina Kurdî jî hewceyî şoreşekê ye. Pêwîst e, em ji bin banê ideolojiyekê derkevin. Bêguman her tişt bi awayekî ideolojîk e, lê cûreyên ideolojiyê hene: hinek tazî ne û hinek jî hêdî-hêdî dixebitin. Ev ideolojiya eşkere bi taybetî di qadên siyasî de zemînekê çêkirî ye di nav civakê de. Dema ku em ragihandinê bi vê şêwazê mezin dikin, li şûna ku civakê ber bi yekîtiyê ve bibin, em carinan civakê ji hev diqetînin. Ji ber vê yekê, divê ragihandina Kurdî rêbaz û şêwaza xwe biguherîne û bêtir pabendî prensîbên ragihandinê bin. Di pêvajoya dawiyê de hinekî ji vê me bi destê xwe peland, dema ku ragihandina Kurdî berê xwe da yekrêziya Kurdan û xeteriya li ser wan, ev cihê şehnaziyê bû. Divê ev berdewam bike û bibe stratejiyek domdar.

**Ji bo gihîştina vê armancê divê îro çi gavên pratîkî werin avêtin?**

Îro Kurd hewcedarî kongreyeke netewî ne. Em nabêjin ku hemû tevgerên siyasî, çimkî dibe ku tevgerên siyasî lingên wan di solên teng de bin, nikarin xwe ji qeyd û bendên ajandayên derdorê xilas bikin. Lê yên ku baweriya wan bi kongreyeke netewî heye, divê bizanin ku ew kongre dikare banekî stratejîk ji bo her çar parçeyên Kurdistanê ava bike. Her beşek jî taybetmendiyên xwe hene û divê di wê çarçoveyê de bixebitin û wan bighînin hevdu. Yên ku nagihîjin hevdu, pêdivî ye ku sedemên vê rewşê werin eşkerekirin. Herwiha, divê rê li pêşiya lîstik û vîlîkên ku di pêvajoya zêdetirî 40 salî de hatine çêkirin were girtin. Ji her demê zêdetir, îro tevgera Kurdî û gelê Kurd amade ne ji bo yekîtiyê. Lê yê ku ne amade ye, siyasetmedar, partî û hin tevgerên Kurdî ne, yên ku astengin di pêşiya vê yekîtiyê de. Di roja îro de tu bihane tune ye ku kesek bibêje em nikarin kongreyeke wiha ava bikin. Ji bo vê yekê, pêdivî ye ku ragihandin bikeve xizmeta vê armancê û propaganda were kirin ji bo avakirina kongreyeke netewî. Dema ku kongreyeke netewî çêbibe, divê kar û xebatê xwe dabeş bike, li aliyê dîplomasî, hiqûqî û siyasî. Bi vî awayî em dikarin di şertên îro de ku herêm ber bi guhertinê ve diçe, rolek girîng bibînin. Heger em ji van guhertinan re ne amade û xîtaba Kurdan yek nebe, em ê careke din ev sedsalê jî winda bikin.



Farûk Sakik

## Dîsa Peyamên Rêber Apo

Min di nivîsa hefta ya buhirî de behsa 3 daxwazên Rêber Apo yên ji dewletê rêz kiribû. Bi israr emê dîsa bibîrbixin. Heyeta Îmrali di derbarê hevdîtinan 27’ê Adarê de hin detay dan. Lê ev 3 şertên ku me ji agahiyên wan yên di kulîsan de bidestxistibûn de, israra ‘es’ derbas kirinê dikin.

Em van 3 daxwazan dubare bikin:

1- Kurd û Tirk di destûra bingehînde wek hev cîh bigirin. (Eşît Vatandaşlik)

2-Perwerde, ji dibistana seretayî hetanî zanîngehê bi zimanê Kurdî be.

3-Qanûnên li pêşiya nasnameya Kurdan astengin werin guhertin û sererastkirin.

Dema ku ev 3 daxwazên Ocalan dihatin nîqaşkirin, birayê wî Mehmet Ocalan vê heftê di hevpeyvînek xwe de sekna Rêber Apo ya Îmrali bi awayek zelal anî rojevê.

1-Perwerde: Zimanê Kurdî dive di hemû qadên jiyanê de were bikaranîn. Bi taybet bi zarokan re axaftina bi Kurdî.

2-Ji bo Rojava 6 meh berê gotî “metirsiyek mezin li pêşiya Rojava heye. Ev taluke dive ji îro de bi tedbîran pêşî lê were girtin. Bi hemû hêzan re lihevkirinek û protokol werin îmzekirin” Bal kişandî ser bêbextiya hêzên li heremê. (Mihemet dibêje; “me ev peyam gihand rêveberiya xweser ya Rojava”)

3- Ji Kurdên Başûr re, ji Kurdên Rojava û yên Rojhilat re dibêjim, bi çi çavî li Serok dinêrin bila binêrin, Serok got “ji tevgerên me yên wê derê re bibêjin, divê li Başûr, Rojava û Rojhilat yekbûna Kurdan çêbibe. Wekî din li Rojhilata Navîn çareya Kurdan nîne. Divê em ji bo hemû parçeyan tiştekî bikin û yekbûnê çêbikin” (Mehmet, tiliya xwe nîşan di da û di got, serok got “Kurdistan yeke”)

4-Ji bo kesên bi taybet êrişî kesayeta wî dikirin jî digot; wî ewrê xwe da vê doze. Bi tenê armancek wî hebû û ewjî, azadiya Kurdistanê bû. (Behsa 4 mîtro qumaşê ku ji diya xwe re nestandî dike)

Bi rojane em li dijî wan kesên êrişî Rêber Apo dikin şiyariyek dikin. Dive herkes ji aliyê xwe de li dijî vê kampanyaya reşkirinê têbikoşe. Civaka me di media dijîtal de hîleyên bi çi rengî hene, baş nizanin û bi wan bawerî tînin.

Mehmet Ocalan bi vê hevpevînê bersiv da hemû nakokiyên di serê civakê de hebûn.

Hin rexneyên wî hebûn em wan dubare nakin û nanîrxînin.

Dive hemû kesên diçin Îmraliyê û vedigerin, peyamên Rêber Apo wek Mehmed Ocalan bê meqes û sansur bi civakê re parvekin.

Dive di destpêkê de civakek ji wî bawer bike were bi rêxistinkirin û piştre paradigma, manifesto û ramanên wî ferî vê civaka ku jê bawer dike were kirin. Berî her tiştî sekna wî ya li Îmrali baş were fahm kirin.

Di vê serdema çareseriyê de hedef vegera kodên sed sala yên Kurd û Tirkan dabûn hev e. Wê demê jî gotibûn 2 gel wek hev dikarin bihev re bijîn. Rêber Apo wan kodên sed sal berê, bi argumanên îroj û li gor konjuktura demê dinîrxîne. Di çareseriyê de ne bi tenê Kurdan, di heman demê de dewletê jî dixe nav liv û tevgerê. Siyaseta dewletê ya li gor kodên înkarkirinê ji nû de diguhêrê û perspektîfên çareseriyê pêşkêşî wan jî dike. Her tiştî dike lê nikarê midaxleyî demê bike. Gelek sozên ku dane wî bi derengî dixin û mixabin nikare midaxleyî vê derengbûnê bike. Dive li vê derê siyaseta demokratîk bikeve dewrê.



# Ji çiraxên wêjeya Kurdî

**Can Yûsiv**

Helbestvan Ciwan Dêrikî; Çavkaniya ku naçike û fenera qet melûl nabe .

Rola helbestvan û nivîskarên Kurd di tevgera rizgariya Kurdistanê û parastina nasnameya neteweyî de, tenê sînordar nema wek çalakiyek edebî an çandî, lê ew bû hêmanek girîng a tevgera neteweyî û çekeke tekoşînê ji bo azadî û serxwebûna çandî û siyasî .

Helbestvan Ciwan Ibrahîm yek ji van helbestvanên hemdem tê hesibandin ku pênûsa xwe terxan kir di xizmeta gelê xwe û doza wî de û barê gotinê û xewna azadiyê hilgirtiye, da ku vedenga afirîneriya wî bibe çiraxek ji bo nifşan û penahek ji bo nasnameya rastîn a Kurdî .

Di himbêza Deşta Hesina ya keskîn de, ku dikeve li ser sînorên Bakur, Rojava û Başûr, û li nêzîkî çiyayê Cûdî yê bilind û çemê Dîcle yê ku bi hêzdarî diherike.

Helbestvan û nivîskarê Kurd Ciwan Îbrahîm, ku bi navê “Ciwanê Dêrikê” tê nasîn, di sala 1962’an de ji dayîk û bavek Kurd (Elî û Reqiya) li gundê Kasanê hate dinyayê, gundê ku di dîrokê de her dem bûye çavkaniya şoreşgeran û penaha tekoşeran.

Ew di nava malbateke Kurdî ya welatparêz û older de ku ji heşt zarokan pêk tê (pênc xwişk û sê bira), ya ku bi hezkirina xwe ya ji bo xakê û bi dilsoziya xwe ji bo welat û azadîyê tê nasîn, mezin bûye.

Di vê mala ku bi rûhê wêje û çandê hatî firşikkirin de, hunêra wî despêkir ; çimkî bavê wî di ciwaniya xwe stranbêj û dengbêjê stranên gelêrî bû, lê piştî ku ber bi ol û sofîtiyê ve çû, wî rêwîtiya xwe ya stranbêjiyê berdewam kir , lê bi rûhek cuda, wî dest bi awazkirina helbestên Melayê Cizîrî kir û wan di civînên olî û hevdîtinên gundiyan de bi dengê xwe xweş digot ,ji ber vê yekê, wî di dilê kurê xwe de tovên helbest û evîna wêjeya Kurdî çand, û herwiha dayîka wî jî ya ku bi eslê xwe Botanî bû, rolek wekî çîrokbêj û parastvanê bîra civakî lîst , wê di şevên dirêj ên zivistanê de ji bo wî û xwişk û birayên wî çîrokên neteweyî û çîvanokên gelêrî vedigot, êdî çîrok û roman bûn yekem çavkanîya xeyalê wî û yek ji girîngtirîn hêmanên hişmendiya wî ya çandî û edebî ya destpêkê .

Ciwan zarokiya xwe di nav baxçên Kasanê yên rengîn û çîmenên wê ên keskîn de, di navbera xirbeyê Kasanê û pêmayên Dêra Fila û Qubeya Elî Şêr de derbas kir, li wir vedenga dengê wî yê yekemîn di navbera deşt û zeviyan de tê vegerandin, û li wir xwezaya Kurdî bi rengên xwe yên bedew û bi dengên xwe yê pirreng bîrdanka wî a pêşîn û nîşanên xeyala wî afirandin,li wir, di navbera qêrîna Dîcleyê û aramîya gund de, çavên wî vebûn li ser cîhanek ku hevbexşiyê dike di navbera hestên germiya malbat û hişkiya çiya û di navbera xuşîna ava çeman û dengê bangê azadî de ku di her kevirek û darekî de yê ku li ser xaka Kurdistanê dijî.

Wî ji kaniya bavê xwe û ji dengê wî ya xweş û ji helbestên wî yên gelêrî , alfabeya zimanê Kurdî û zanistên helbestê vexwar û di dilê wî de tovên yekemîn yê helbestê hatin çandin, herwiha ji ava kaniyên gund (kaniya Îbrahîm û çavkaniya Resûl) taybetmendiyên hişmendiya xwe yê torevanî wergirt , di heman demê de ji dengê çeqeçeqa aşê avê û çîvçîva çûkan û xumxuma cobaran ew fêr kir ku çawa peyvê saz bike û helbest çawa vehûne, xumxuma pêlên ava Dîcle û fîrefîra bayê Cûdî û Bêxêr rûhê xweparêziyê û hewldana jiyanê û mayînê di dilê wî de xurt kirin, û ew deng jê re bûn dibistaneka destpêka fêrkirina wî ka çawa helbest tê nivîsandin û peyv tê parastin.

Wî perwerdeya seretayî li dibistana gundê xwe Kasanê stand , li wir ew bi hewesa xwe ya ji bo zanînê û ezberkirina nivîsanên gelêrî dihate nasîn, û di heman demê de wî ji kaniyên mîrateya devikî “stranên cotkaran, sirûdên dewatan, çîrokên dapîran û lavijên olî.” bingehên yekemîn yê hişmendiya xwe ya wêjeyî afirandin.

Bi veguhastina malbatê bo Dêrikê di sala 1978’an de, asoyên wî yên perwerdeyê fireh bûn, wî xwendina xwe ya amadehî û navîn li wir qedand , berî ku tevlî “Peymangeha amadekirina mamosteya” li Hesekê û paşê “kulîjeya perwerdeyê” li Zanîngeha Feratê bibe ,li wir wî di ziman û wêjeyê de xwe kûr kir , û amûrên xwe yên ramyarî pêş xistin, da ku girêdana xwe bi çanda kurdî ya hemdem û şepêlên edebî yên nûvekar zêdetir bike.

Piştre, dest bi rêwîtiyek dirêj di qada perwerdeyê de kir ku 42 salan domand,û di nav dibistanan de digeriya, zanyarî belav dikir û peyama xwe ya perwerdeyî dixist di bin xizmeta civakê û nifşên nû de. Lê belê, tevlêbûna wî di çalakiyên edebî û çandî de, û girêdana wî ya xurt bi nirxên Kurdeyatî ve, kir ku ew bibe armanca astengkirin û zextan ji hêla rayedarên Baas ve, ku di sala 2013’an de ew ji karê wî dûr derxistin, lê wî dev ji peyama xwe berneda, li dijî vê, êş veguherand hêzbûn, helbest jî kir qêrîna dilê xwe û ronahiyek hêvî ku nasnameyê biparêze û ruhê xweparêziyê xurt bike, piştî dûrxistina wî ji kar wî sê salan li Zanîngeha Rojava ders dan, li wir dersên wêjeya kurdî û şêwazên wêjeyî didan, û ezmûna xwe ji bo xwendekaran parvekir û rolek girîng lîst di pêşxistina zanistên wan yên edebî de, hêjayê gitinê ye ku di sala 2011’an de ew yek ji mamosteyên despêkê yê zimanê kurdî û sazkerê Saziya Zimanê Kurdî bû, niha jî bi erkê hevserokatiya peyamangeha Bilind a Hunerê ya Rojavayê Kurdistanê radibe.

Wî di qonaxa amedehî de dest bi nivîsandina helbestê kir ,piştî ku ji zarokiya xwe ve fêrî tîpên Kurdî yên Latînî bû, bi saya bavê xwe, herwiha bandorek kûr ya dîwana Seydayê Cegerxwîn “Kîme Ez” – ku ji dest şehîd Îsmaîl (Simko) wergirt bû li ser avakirina hişmendiya wî ya edebî û baldariya wî bo peyva pabendî hebû. Di salên Notan de, wî dest bi nivîsandina helbesta klasîk, ya rêzbend û kêşe kir , lê zû dest bi nivîsandina helbesta nûjen , azad û pexşan kir , di bin bandora dibistana Melayê Cizîrî û Cegerxwîn de ku hevrêzîyek di navbera resenî û nûvekirinê de çêkir.

Mijarên wî girêdayî bûn bi pirsgirêkên welat û rûmetê û him xewnên azadiyê ku di wijdana gel de hatibûn çandin, wî li ser bedewiya Kurdistanê û xwezaya wê, li ser şoreş û azadiyê, û li ser şehîd û şoreşgêrên ku bi xwîna xwe rêya rûmetê ronî kirîn nivîsî, û jin kire sembola” rûmet û pêdariyê”

Lê riya wî di wêje û çandê de ne raxstî bû bi gul û kulîlkan, her dem pêrgî zextên siyasî û sînorên ku ji hêla rayedarên Behis ve hatbûn ferz kirin dihat ji ber helwestên xwe yên welatparêzî û çalakiyên xwe yên çandî yên bi nasnameya kurdî ve , helbest ji bo wî amûrek bû ji bo derbirîna hestên azadî û rûmetê , lê di heman demê de bû sedema armanc girtina wî, ew hat binçavkirin û hin caran li ser wî qedexekirina weşandinê hate ragihandin, heta ku ji kar jî hate avêtin, wekî hewlê ji bo qutkirina dengê wî yê wêjeyî û berxwedanî, lê van beramberiyan ne karibûn hêrsa dilê wî bişkînin; bilî wisa, hêza helbestê û hûrdemîna peyama wî zêde kirin.

Çalakiya wî ya wêjeyî tenê bi helbest re sînordar nema, lê gihişte heta şano, gotar û kurteçîrokan, di salên notan de ji bo Koma Cûdî çend şano û skeç jî nivîsand , di gel nivîsîna gotar û lêkolînan di ziman û wêjeya kurdî de, heya niha du berhemên helbestî çapkirine :



1- “Xwedawendên Bedewiyê” -( 2015) ji hêla Desteya Çandê ve.

2- “Roj” - ( 2018) ji hêla Yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cezîreyê ve.”

Herwiha wî reşnivîsên şeş berhvokên helbestî hene li benda çapkirinê ne û di nav wan de berhevokek jî heye diyarî Şehîdên Azadiyê kiriye , ew li ber weşanê ye, di gel du pirtûkên din ,yek kurteçîrok û ya din jî gotar .

Wî gelek helbestên stranbêjiyê ên terazû nivîsîn ji hêla hunermend û komên navdar ên Kurdî ve hatin awazkirin û strandin, ji wan Koma Cûdî bi taybetî gelek stranên navdar ji nivîsên wî çêkirin wekî:

1- Ava Mezin
2- Apo Gele
3- Amedê
4- Heval Mihyedîn
5- Cizîr li ser Piya ne

Bi vî rengî, peyvên wî veguhêrîn stranên gelemperî ku hestên gelê kurdî vedibêjin û dengê azadiyê ji nifşekî digihînin yên din , ji nav helbestên wî yên navdar ku di nav gelê kurd de deng vedane:

1- Xwedawendên Bedewiyê
2- Apo Gele
3- Zindana Faşîstan
4- Komkujiya Şengalê.

Rola wî tenê bi nivîsara edebî sînordar nema , lê bi kûrahî tevlî xebatên çandî û ramyarî bû ,ew beşdarî damizrandina gelek çalakî û civînên rewşenbîrî bû, çi bi veşartî û çi bi vekirî , ji salên Notan ve, ew di dïmena çandî de wek dengek çalak û amedekar maye.

Ew yek ji damezrênerê ‘’koma Wêje’’ 1990 li Dêrikê, û di navbera salên 1991-1997 di nav ‘’Koma Cûdî’’ de beşê rêxistinî û wêjeyî de cî girt , herwiha ew yek ji damezrênerê kovara ‘’Rojda’’ 1997 li Rojava û ‘’Tevna Çand û Hener’’ 2005 li Dêrikê ye û Endamê yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê ji sala 2011’an ve ye û roleke girîng di kongir , şevbuhêrk û festîvalên wê de lîstiye.

Helbestvan Ciwan di sala 1984’an de zewiciye ew bavê pênc zaroka ye (çar keç û yek kur) û ew ji peyama xwe ya edebî û çandî re dilsoz mabû, karîbû hevsengîyekî bike di navbera karê malbata xwe û wefadariya ji wêjeyê re.

Ciwan yek ji helbestvanên edebiyata pabend tê hesibandin, yên ku gotinên xwe kirine di xizmeta parastina nirxên neteweyî, ziman û nasnameya kurdî de ew bû nimûneyek ji bo helbestvan - mamoste ku hevrêzîyek kir di navbera peyama perwerdehiyê û peyama wêjeyê de û di navbera girêdana bi xakê û têgihiştina asoyên azadiyê de ,wî jiyananameya xwe kir neynikek ji bo dîroka gelê xwe û helbesta xwe kir dengek ku xakê û bîranînê bi hev re biparêze ,bi saya tecrubeyê xwe a dirêj , ew beşdarî parastina zimanê kurdî û dewlemendkirina wê bû ji aliyê bedewiyê ve , helbest kir amûrê berxwedanê û parêzvanê nasnameyê.

Wî berhemên xwe di kovar û rojnameyên Kurdî de weşand, û di semîneran û şevbuhêrkên edebî de di herêmên cûda yên Rojavayê Kurdistanê de beşdar bû, dengê wî her amede bû di nava şopdarên wî de û bû îlhamek ji bo nifşên nû yên helbestvan û rewşenbîran.

Helbestvan Ciwan hê di xurtbûna dayîn û afirîneriya xwe ya Wêjeyî û Çandî de ye , hîn jî berdewame di vehûnandina helbestê de bi hemû şêwazên wê ve , ji klasîk heya azad , û bi rûhê jiyanxwaz kurteçîrok û gotaran dinivîse, mîna ku bi tîpên zêrîn li ser rûpelên bîra kurdî xêz dike, bêyî westan û rawestandin ,ji bo wî, peyv peyam û hebûne, û çavkaniyek zuha nabe ji afirandin û pabendiyê .

Hêviyên min ji bo wî serkeftin û afrîneriyek zêdetir di rêwîtiya wî ya wêjeyî û ramyarî de.

# Ji bo xebtandina stasoyona Elok stasyoneke gerok ji Rimêlan derbasî Dirbêsiyê bû

**Rêveberê Stasyona Elektrîkê ya bajarê Dirbêsiyê Ciwan Ehmed diyar kir ku ew hewildanên xwe ji bo xebitandina Stasyona Elektrîkê ya Dirbêsiyê dikin û got, "Eger rewş baş derbas bibe, dê di 10 rojên bê de elektrîk bighêje Stasyona Avê ya Elok û wê stasyon têkeve xizmetê."**

Jîn Hisên/Dirbêsiyê

Di çarçoveya berdewamiya zehmetiyên ku li hember sektora elkrtîkê û avê li kantona Cizîrê derdikeve herwiha di nava hewlidanên ji bo başkirina binesaziyê û dabînkirina elktrîkê ji bo şêniyan, Desteya Enerjiyê ya Rêveberiya Xweser a kantona Cizîrê stasyoneke gerok ji Rimêlan bir bajarê Dirbêsiyê. Ev yek bi armanca gihandina enerjiyê ji bo Stasyona Avê ya Alokê e, da ku bixebite û av bighêjê her kesî, li gorî Rêveberiya Xweser a Herêma Cizîrê ku li ser rûpela fecbookê ragihandibû.



Ev gav bi armanca dabînkirina elektrîkê û misogerkirina berdewamiya gihandina avê ji bo şêniyên herêmê hat avêtin. Bi vê destwerdanê, tê payîn ku pirsgirêkên teknîkî yên stasyonê kêm bibin û xizmetguzariyên bingehîn bi rengekî baştir bigihêjin ber destê gel.

Di heman demê de gav encama hewldanên berfireh ên Desteya Enerjiyê ya Rêveberiya Xweser a kantona Cizîrê bi hevkariya kampaniya Elektrîkê ya Rimêlanê hat kirin. Herwiha pêvajoya veguhastinê bi hevahengiya rêxistinên navneteweyî re hate kirin, bi armanca misogerkirina ewlehiya veguhastin û xebitandina stasyonê, di nava şert û mercên ewlehiyê yên dijwar ku herêm tê de derbas dibe.

### Ji ber êrişan Stasyona Dirbêsiyê ji xizmetê derketibû

Stasyona elektrîkê ya Dirbêsiyê ji ber êrişên dewleta Tirk a dagirker, nêzîkî salekê bi awayekî giştî ji xizmetê derketibû, di demekê de ku aliyên peywendîdar berê xwe didan avakirina stasyonên elktrîkê yên gerok, ji ber hedefgirtinên dûbare yên li ser avahiyên enerjiyê li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê.

Desteya Enerjiyê daxuyand ku tîmên wan ên teknîkî, bi şev û roj di nava liv û tevgerê de ne da ku xebatên çeksazkirina stasyonê bi dawî bikin. Ev hewldan ji bo misogerkirina herikîna elektrîkê û gihandina ava vexwarinê ji bo gelê herêmê tên kirin, da ku pirsgirêka avê bêyî derengî were çareserkirin.

### Hewildanên jinûve xebitandina stasyona Dirbêsiyê

Di dîroka 2023-1-15 di encama du êrişan ji hêla bafirlên bêmirov ên dewleta Tirk li ser Stasyona Dirbêsiyê hatin kirin, di encamê de stasyon nêzî saleke bi temamî ji xizmetê derket. Di vê derbarê de Rêveberê Stasyona Elktrîkê ya Dirbêsiyê Endezyar Ciwan Ehmed ji rojnameya me re diyar kir ku piştî hewildanên mezin ku Desteya Enerjiyê pêk anî, karîbû piştî salekê dîsa stasyonên bixe xizmetê û wiha got: "Ji ber qutbûyîna elktrîkê av bi temamî li ser bajêr hatibû qutkirin di heman demê de li ser avahiyên îstratîjîk wekî nangehan û hwd... di vê çarçoveyê de Desteya Enerjiyê ya girêdayî Rêveberiya Xweser a kantona Cizîrê gelek hewildan kirin ji bo girtina çareseriyên awarte da ku elktrîkê bo bajêr bê vegerandina."

### Başkirina aramiya elktrîkê

Ciwan Ehmed diyar kir ku ji ber stasyona elktrîkê li bajarê Dirbêsiyê tune ye, Desteya Enerjiyê stasyoneke gerok ji Rimêlan veguhest Dirbêsiyê û wiha axaftina xwe berdewam kir: "Ji bo başkirin û pêkanîna aramiya elktrîkê li bajarê Dirbêsiyê û gundewarê wê, di heman demê de piştgîriya Stasyona Ava Elokê Desteya Enerjiyê Stasyoneke gerok ji bajarê Rimêlan veguhest ji bo bajarê Dirbêsiyê. Ji xwe rêjeya elktrîka ku dighêje bajêr ne sabît e, carnan rêje baş e û carnan kêm e, niha rojane derdora çar seatan elktrîk dighêje bajarê Dirbêsiyê û du seatan bo gundewarê wê tên piştgîrkitrin."

### Hewildanên xebitandina Stasyona Elok

Stasyona ava Elokê yek ji girîngtirîn stasyonên herêmê ye, ji ber ku ew çavkaniya sereke ya ava vexwarinê ya bajarê Hesekê ye. Ji ber vê yekê, hewl li ser vegerandina dabînkirina elektrîkê ji bo stasyona elektrîkê ya Dirbêsiyê hatine dayîn da ku jinûve dest bi xebatê bikin.

Ciwan Ehmed derbarê xebitandina Stasyona Elok û piştgîriya wê di hêla elkterîkê de wiha anî ziman: "Stasyona Elok, avê ji bo bajarê Hesekê û gundewarê wê herwiha ji bo hin beşan ji bajarê Til Temirê û gundewarên parve dike. Wekî em dizandin Stasyona Ava Elok di bingeha xwe di ji hêla stasyona Serêkaniyê tê piştgîrkirin, lê ji ber êrişên dagirkeriya Tirkiyê li ser stasyonê di sala 2019'an de ji xizmetê derket, lê wekî çareseriyeke demikî stasyona Elok ji aliyê xeta elektrîkê ya 66 kîlovolt a di navbera stasyona Dirbêsiyê û stasyona Elok a Serê Kaniyê de kirin hat piştgîrkirin, niha wê bi rêjeya 20 kîlovolt bê piştgîrkirin, ku bi vê rêyê wê bîr û stasyonên pompekirinê yên stsyona Elok bên piştgîrkirin."

### Xebatên çeksazkirinê

Ciwan Ehemd bal kişand li ser xebatên sererastkirina stasyonê û wiha diyar kir: "Stasyona Dirbêsiyê em karin bêjin hema amade ye, lê sererastkirin hîn jî tên kirin li ser xeta elektrîkê ya di navbera Dirbêsiyê û Stasyona Elok de, ji ber ku ew hewceyî çeksazkirinê ne, herwiha dikeve aliyê din ku di bin kontrola artêşa Tirkiyê de ye. Niha em bi parêzgarê Hesekê Nûredîn Ehmed û hin aliyên peywendîdar re hemahengiyê dikin, da ku rê bê vekirin û tîmên teknînê karibin bikevin wir û xetê sererast bikin. Em pêşbînî dikin ku piştî sererastkirinê û eger rewş baş derbas bibe, dê di 10 rojên bê de wê elktrîk bighêje Stasyona Avê ya Elok. Ji bo stasyonên pompekirin û bîran wê Saziya Avê bişopîne da ku kengî amade be ji bo bixin miriyetê. Ê me karê me yê sereke ew e gihandina elktrîkê bo Stasyona Elok e."

### Zehmetî û pirsgirêk

Rêveberê Stasyona Elktrîkê ya Dirbêsiyê Ciwan Ehmed wiha axftinên xwe qedand: "Ji pirsgirêkên serek ku li hember Stasyonên Avê û Elktrîkê derdikeve, kevnbûna alava ne herwiha ew hewceyî sererastkirinên domdar in, an jî ji hêla rêxistinên herêmî û navdewletî piştgirî bên pêşkêşkirin ji bo dabînkirina hin parçeyên pêwîst ên stasyonan ji ber ku li Sûriyê tune ne."

Hêjayî gotinê ku hin stasyon, bi taybetî li deverên nêzîkî eniyên şer ên wekî navçeya Zirganê, ji ber zirara berfireh a ku lê çêbûye, bi salan e bê xizmet in, ku ev yek bûye sedema ku ev dever bi tevahî ji elektrîkê bêpar bimînin.

Bi gelemperî, rastiya Stasyonên elektrîkê û avê li Dirbêsiyê û Hesekê dîmeneke aloz nîşan dide, ku zirara teknîkî bi pirsgirêkên ewlehiyê ve girêdayî ye, berevajî hewldanên berdewam ên ji bo jinûve destpêkirina stasyonên girîng, bi taybetî stasyonên Dirbêsiyê û stasyona Elokê, ji ber ku ew bingeha vegerandina xizmetguzariyan ji bo gelê herêmê ne.

Di salên dawî de, stasyonên elektrîkê yên li kantona Cizîrê, ji ber zirara ku gihaşt binesaziya stasyonan û xetên elktrîkê, di pêşkêşkirina xizmetan de kêmbûneke mezin hate dîtin. Ev yek rasterast bandor li ser aramiya elektrîkê û avê kiriye, di heman demê hişt ku rayedarên pêwendîdar hin planên awarte yên ku balê dikişînin ser jinûve destpêkirina stasyonan gav bi gav, deynin wekî çareseriyek alternatîf.

# 'Qeymax û hingiv xwedî girîngiyeke kûr ya çandî û civakî ne'

Solîn Mihemed/ Qamişlo

**Xwediyê firoşgeha xwarinên taştê Mihemed Zekî diyar kir ku qeymax û hingiv di nava xwarinan de xwedî girîngiyeke kûr ya çandî û civakî ne.**

Di nava civakê de û ji bo tenduristiyeke baş taştê weke xwarinek esasî ya rojê ye. Bi taybet di çanda kurdewarî de, ji xwarinên ku di demên berê de her roj li ser sifreya her malbatekê (hingiv, gêmer, mast û qaymax) bû. Ji ber ku feydeyên wan ji bo tenduristiya laşê mirovan pir baş e, enerjiyê dide mirovan di heman demê de jî pir tamxweşin.

Li bajarê Qamişlo bazara Hingiv û Gêmer cihê yekem e ku şêniyên bajêr berêxwe didin wê ji bo xwarina taşteyeke kevneşopî. Di bazarê de hemû cûreyên taştê yên mîrate di nav xwe de digre di serî de hingiv û qeymax li gel cureyên din wekî penêr, zeytûn, lebnê, mast, mekdûs, mamûniyê û rûnê erebî û hwd tê pêşkêşkirin. Beşa hingiv û qeymax li bazarê ne tenê cîhekî bazirganiyê ye, lê ew xwedî girîngiyeke kûr ya çandî û civakî ye.

### Serdanên malbatan bo kirînê kêm bûye

Di van demê dawî de ji ber rewşa jiyanî ya zehmet serdanên welatiyan bo kirîna hingiv û gêmer kêm bûye, ji ber bilindbûna nirxê wê lewma kirîna wê kêm bûye. Herwiha malbat herî zêde berê xwe didin kirîna cûreyên din ên taştê li gorî hêza xwe a kirînê. Di derbarê mijarê de xwediyê firoşgeha xwarinên taştê Mihemed Zekî ji Rojnameya me re

### 'Hingiv û qeymax di civaka me de navdar e'

Mihemed Zekî diyar kir ku ew bi salan di vî warî de dixebite û wiha got: "Ez ji beriya 33'ê salan vî karî dikim. Di demên borî de serlêdanên malbatan ji bo kirîna Hingiv û Gêmer pir zêde bû lê bi demê re ji ber rewşa jiyanî ya zehmetiyên pir kêm bûye û carinan jî gelek roj derbas dibin em tu kesî nabînin. Di firoşgehê de hemû cûreyên taştê em difiroşin di heman demê de wekî xwaringehê ye jî mirov dikare li ba me taştê bixwe, buhaya her sênîkek ji xwarina taştê bi 15 hezarê Sûrî ye."

### Buhayên qeymax û hingiv

Mihemed Zekî di derbarê buhayan de wiha anî ziman: "Her kîloyek hingiv di navbera 150 hezar û 350'î hezarî tê firotin. Hingivê ji cûreya sada, hingivê bişan û yên bi mikeseratan jî li cem me tê peyîdakirin.

### 'Kesê serdana Qamişlo dike berê xwe dide firoşgeha me'

Mihemed Zekî axaftina xwe wiha qedand: " Herî zêde dema ku hin malbat serdana Qamişlo dikin ji bîr nakin ku berê xwe bidin bazarê, tên taştê dixwin û di serî de daxwaza Gêmer û Hingiv dikin. Ji xwe em Hingivê xwe ji "Taxa Teyî" dabîn dikin."



### Dîroka bazarê vedigere serdema kolonyalîzma Fransî

Hêjaye gotinê ku bazara Gêmer û Hingivê bi dîrokeke dewlemend a ku vedigere serdema kolonyalîzma Fransî li herêmê, tê naskirin. Bazar ji axurekî hespan a Fransî veguherî firoşgehên ku xwediyên wan mîrateyan bav û kalên xwe parastin e ku û bûne cihekî girîng ji bo mêvanên ji deverên din re.



# 'Heta Rêber Apo û girtiyên zindanan azad nebin aştî ne pêkan e '

**Dayika Aştiyê Afîfe Kartal diyar kir ku baweriya wê bi dewleta Tirk nayê, heta ku girtiyên zindanan û Rêber Apo azad nebin, nikare were gotin ku aştî heye û got, "Mafê hêviyê yên girtiyan pêk nayê, lewra heta ku zarokên me di girtîghehan de bin, em ê qîr bikin."**

Ronaz Silêman

Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) her çiqas "Mafê Hêviyê" ji bo Rêber Apo û gelek girtiyên din kiribe Rojevê jî dewleta Tirk heta niha ji bo bicihanîn û nasîna mafê hêviyê gavek neavêtiye. Lê piştî banga dîrokî ya Rêber Apo ku di 27'ê Sibata 2025'an de kiribû, yek ji mijarên herî zêde hatiye rojevê û girîng e ku di zûtirîn dem pêk bê, "mafê hêviyê" ye. Mafê hêviyê, mafekî ji bo girtiyên ku cezayên heta hetayê (muebetê) li wan hatiye birîn tê nirxandin. Li gorî vî mafî, girtiyekî/e di vê rewşê de, piştî ku 25 salan di girtîgehê de ma, dikare serî li dadgehê bide. Dadgeh jî rewşa wî/ê dinirxîne, li ser serbestberdanê an jî domandina girtîbûnê biryar dide. Ev maf rê vedike ku kesên girtî zanibin heta dawiya temenê xwe di girtîgehê de namînin, dema şert guncav bûn, dê werin berdan.

### Tirkiyê mafê hêviyê dike Rojev pêk nayîne

Mafê hêviyê di 9'ê Tîrmeha 2013'an de ji aliyê Daîreya Mezin a DMME'yê ve hatiye qebûlkirin. Cara yekem di dozek ji Brîtanyayê ku weke "Doza Vinter" tê zanîn de (9 Tîrmeh 2013) mafê hêviyê hat dayîn. Piştî vê biryarê, welatên weke Belçîka, Polonya, Fînlandiya, Fransa, Efrîqaya Başûr, Brîtanya, Almanya, Îtalya, Ispanya, Portekîz, Norweç, Îsveç, Amerîka (li gorî eyaletan diguhere) û Tirkiyê jî di nav de 32 welatan mafê hêviyê erê kir.

### Mafê hêviyê Piştî 25 salan ji bo girtiyan heqe

Li gorî biryara DMME'yê, dema ji welatekî ku ev biryar erê kiriye, girtiyek ji bo mafê hêviyê serlêdanê bike, divê rewşa wî/ê ji aliyê dadgehên wî welatî ve were nirxandin. Girtiyek ku cezayê muebetê jê re hatiye dayîn, dema 25 sal temam bûn, serî li dadgehên wî welatî dide û daxwaza pêkanîn mafê hêviyê dike. Lê dema ev maf nehat pêkanîn, girtî serî li DMME'yê dide. DMME jî rewşê dinirxîne û ji bo wî welatî pêşniyara pêkanînê dike. Dema ku pêşniyara DMME'yê nehat pêkanîn, wê demê girtî yan jî parêzerên wan dikarin serî li Konseya Ewropayê bidin.

### Tirkiyê ji bo pêkanîna mafê hêviyê nayê lêpirsîn kirin

Tirkiyê jî tevî ku ew yek ji wan welatên li ser vî mafî erê kiriye, lê ew vî mafî binpê dike. Ji ber li Tirkiyê girtiyên zindan hene zêdeyî 25 salan girtî ne û heya niha çarenûsa wan ne diyar. Herwiha ji derveyî ku mafê wan ê hêviyê pêk nayê, hemû cureyên eşkence û hwd... rojan dibînin. Di heman demê de gelek girît ji ber nexweşiyan, rewşên wan pir xerab in. Lê ev hemû berbiçav nayê girtin û lêpirsîn ji dewleta Tirk nayê kirin. Bi taybet ji bo Rêber Apo jî ev yek derbasdare ku ev zêdetirî 25 salan e li zindanê de ye û mafê hêviyê jêre heq dike, lê dewlet vî mafî nadêyê, hem jî di gelek caran de jî birayên hişk li ser Rêber Apo daye ferzkirin.

### Gelo Mafê Mirovan a Ewropayê rewşa zindanên Tirkiyê naşopîne?

Mafê hêviyê di çarçoveya Madeya 3'yan a Peymana Mafê Mirovan a Ewropayê de, weke parçeyek ji pîvana "parastina ji êşkence û kiryarên dermirovî" tê nirxandin. Lewma welatên ku biryar erê kirine, neçarin pêk bînin. Komîteya Wezîran a Konseya Ewropayê ji bo pêkanîna biryarê welatan kontrol dike û pêvajoya şopandinê dide destpêkirin. Encamên binpêkirinê; DMME dikare careke din binpêkirinên li welat lêkolîn bike û biryarên nû bigire, biryara tezmînata (teiwîd) madî û manewî bigire. Komîteya Wezîran dikare fermana guhertina sazûmankirina zagonan ji bo welatekê bike. Welatên ku biryaran pêk neyînin, di civînên Konseya Ewropayê de tên rexnekirin. Ev yek jî, ji bo prestîja wî welatî rewşeke neyînî derdixîne holê. Di rewşa binpêkirinên cidî de, dibe ku ew welat li gorî Madeya 8'emîn a Zagona Konseya Ewropayê, ji aliyê Komîteya Wezîran ve ji Konseyê bê derxistin. Girtî û saziyên mafê mirovan dikarin li gorî Madeya 34'emîn a Hevpeymana Mafê Mirovan a Ewropayê serî li DMME'yê bidin û dozê li welat vekin, zextên siyasî û zagonî li ser welat çêbikin. Lê li gorî van hemû zagonan, em bala xwe bidinê dewleta Tirk heya roja îro bi çi nêzîkatiyê nêzî girtiyan dibe û hemû qanûnên heyî ji bo girtiyan paşguh dike û li gorî xwe eşkence û hwd... li girtiyan dike, tevî wê jî tu bendek ji van bendên li jor li ser nehatiye pêkanîn. Ji ber wê ew di berdewamkirina şêwazê xwe yê xerab ê li hemberî girtiyan de berdewam e. Di vir de jî ne mafek ji bo girtiyan, ne jî ji bo parêzer û malbatên girtiyan li Tirkiyê heye. Ji bo wê bêdengkirina li ser van sûcan û binpêkirina mafê girtiyan li zindanên Tirkiyê ji aliyê hemû sazî û kesên têkildarî parastina mafê girtiyan, bi Tirkiyê re dibe hevkar.

### Pêwîste mafê hêviyê dereng nekeve

Ji bo pêkanîna mafê hêviyê, ji welatan re demek nehatiye diyarkirin. DMME biryara dema pêkanînê ji welatan re dihêle. Lê Konseya Ewropayê ji bo pêkanînê, demekê pêşniyar dike û dixwaze ku ev dem dirêj nebe. lê belê divê ev dem ewqas dirêj nebin ku "Mafê hêviyê" yê girtî ji holê rake. Lê weke ku me di jore de jî eşkere kir, DMME'yê, di biryara xwe ya Vinter/Qraltiyên Yekbûyî de behsa 25 salan dike ku herî dereng divê piştî 25 salan ev maf li ber çavan bê derbaskirin.

### Tirkiyê tenê bi nav pêvajoyê dimeşîne

Girêdayî vê yekê ji bo mafê hêviyê yê Rêber Apo bi dehên caran serlêdan ji aliyê parêzerên wî û gelek aliyan ve, ji bo cihê têkildarî vê mijarê hatiye kirin, lê mixabin heya niha tu rastiyeke ku vî mafê ji Rêber Apo re ji aliyê dewleta Tirk bide nîşandan, nehatiye xuyakirin. Dîsa jî serlêdan berdewam in ku herî dawî di vê meha Nîsanê de jî Parêzerên Buroya Hiqûqê ya Sedsalê ji bo "mafê hêviyê" yê Rêber Apo daxwaznameyek pêşkêşî Komîteya Wezîran a Konseya Ewropayê kir û li ser vê yekê xebat tên kirin. Herwiha tevî ku bi destpêkirina Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk re yek şertên bingehîn ev mafe, lê di vir de wekî her car xuya bû dewleta Tirk tenê bi nav dixwaze pêvajoyê bide meşandin. Li ser vê bingehê niha kampanya navneteweyî ya mafê hêviyê hatiye destpêkirin, armanca bingehîn jê jî, misogerkirina vî mafî ji bo Rêber Apo ye.

Derbarê mafê hêviyê yê Rêber Apo û hemû girtiyên siyasî, dayika Aştiyê Afîfe Kartal ji Rojnameya me re axivî.

### 'Li her derê yasa li ser me hene'

Afîfe Kartal di destpêka axaftina xwe de diyar kir ku baweriya wê bi dewleta Tirk tune ye û wiha got: "Em dayikên aştiyê û gelê Kurd hemû dibêjin em li pey aştiyê ne, lê em baweriya xwe bi dewleta Tirk qet nayînin. Ji ber ev serê sal û mehekê derbas bû ku pêvajo dest pê kiriye, lê em tu aştiyekê nabînin. Heta ku dewleta Tirk rêberê gelê Kurd Rêber Apo, bernede, aştî pêk nayê. Berî çend rojan ez ji zindana Antalya'yê hatime, lê hîn girtiyên ku 33 salan e li zindanê ne, cezayê wan qediyaye, bernadin. Ev çi aştiye ku ew behsa wê dikin? û girtiyên nexweş ku 30 salan di zindanê de ne, bi nexweşiya penceşêrê ne, çavên wan nabînin, dest û lingên wan tune, bernadin. Heta ku ev girtiyên me neyên bernedan, em nabêjin aştiyê heye. Kengî ku ev girtiyên me yên bêling û kor berdan, wê demê em ê bêjin aştî heye. Em li ku derê tevger bikin, yasa li ser me heye. Me rojbûna Rêberê xwe pîroz kir, yasa li ser me hebû. Binçavkirin heye. Em vê şidet û binçavkirinê qebûl nakin. Li vir ez nikarim bi serbestî bêjim ez Kurd im û aştî bixwazim. Tevî wê jî heta ku em sax bin em ê bêjin aştî, ji ber em aştîxwazin."

### 'Heta ku zarokên me li pişt wan deriyan bin, em ê qîr bikin'

Afîfe Kartal eşkere kir ku heta zarokên wan li zindanan bin, ew ê biqîrin û wiha anî ziman: "Rêber Apo dibêje; bila Tirkiyeke demokratîk ava bibe. Lê em dibêjin: Bila Kurdistaneke demokratîk çêbibe, em li her çar parçeyên Kurdistanê bibin yek. Sînor ji nava me rabin, em bi hev re azad bibin û bi hev re bijîn. Wê demê em ê bizanin ku aştî heye. Heta ku ew aştî û azadî neyê pêşiya me, heta ku Rêber Apo û zarokên me ji zindanan neyên berdan, em xwediyê mafên xwe nabin û tu mafek ji me re tune. Lê dema ev yek pêk hat, wê demê em ê nas bikin ku em xwişk û birayê hev in. Lê heta niha me ne azadî û ne jî aştî, nedîtiye. Dema em bi rehetî derkevin û bê yasa li ser me bin, em ê bizanin ku mafê gelê kurd û azadiya me heye. Ji bo wê jî heta ku zarokên me di girtigehan de bin, em ê qîr bikin."



### 'Heta ku deriyên zindanan venebin, em ê nabêjin aştî heye'

Afîfe Kartal axaftina xwe wiha qedand: "Me bi hezaran şehid dane. Zarokên me yên ku îro li serê wan çiyayan tê dikoşin ji ber zilam dewleta Tirk berê xwe dane serê wan çiyayan. Îro ji bo ku bikaribin werin bi awayek azad tevlî siyasetê bibin, lazime dewlet aliyê hiqûqî de gavan bavê je. Heman demê de heta ku dewleta Tirk bi Rêber Apo re neyê ser masê û diyalog pêş nexin, em nikarin bibêjin azadî heye. Di roja rojbûna Rêber Apo de, derdora me tijî leşker û candirmanên Tirk bû, lewra dema ev hêz li derdora me bin, em nikarin bawer bikin ku aştî heye. Kengî ku ji derdora me derketin, wê demê em ê bawer bikin. Bila aştî li her çar parçeyên Kurdistanê hebe, bila her çar parçe yekiti û hevgirtina xwe xort bikin. Dilê me ji bo aştiyê lê dide. Min çar zarokên xwe ji malê li ber çavên xwe, winda kirine, girtî bûne an jî şehîd bûne, yek jê jî li çiyan e. Digel van hemûyan jî, dîsa ez dibêjim aştî û aramî. Hevalên wekî min pir in, em hemû bi kul û derdê xwe dijîn. Ji bo wê heta ku deriyên zindanan venebin, em ê nabêjin ku aştî heye."

# Agirbesta Rûsya û Ukraynayê piştî cejina Paskalya bi dawî bû

Şerê Rûsya û Ukraynyayê ku ji sala 2022'an ve hatiye destpêkirin, heta niha dewam dike. Ji ber vî şerê ku 4 salan dirêj kiriye her du dewletan zereke mezin dîtin. Di 9'ê Nîsanê de agirbest ji hêla her du aliyan ve hate ragihandin, lê dîsa binpêkirin derheqê agirbestê de çêdibe, derencamê de agirbesta ku ji bo cejina Paskalya hatibû destpkirin, hat têkbirin û dîsa şer qewimî.

**Hemza Sêvo**

### Hêza Rûsyayê di şer de

Rewşa Rûsya niha ji salek an du sal berê baştir e. Binesaziya xwe ya leşkerî û serbazî ji nû ve saz kir da ku hewcedariyên eniya xwe ya leşkerî peyda bike û êdî aloziya kêmbûna çekan derbas bike, kargehên hilberîna cebilxaneyan li çiyayên Ural û Sîbîryayê hatine avakirin û hevkariya leşkerî-teknîkî bi Koreya Bakur re hate pêkanîn, sedem ew e ku Koreya Bakur amadekariya şerê xwe yê bi Komara Koreyê re dike. Di dema heyî de Rûsya xwedîyê komek pêşketî ya dronan e, ji dronên êrîşê yên wekî 'Lancet' û 'KUB', heta dronên keşfê û dronên dûr ên ku dikarin di navbera 1000 û 1500 kîlometreyan de bifirin. Wekî din, artêşa Rûsyayê bi saya terzî xizmeta dilxwaz a bi bandor hêza xwe yên mirovî xurt kir. Li hêla din malbatên leşkeran gelek alîkarî û mûçeyên bilind werdigirin. Rûsya ne tenê bi Çînê re, di heman demê de bi Îranê re, di warê hevkariya leşkerî-teknîkî de û bi welatên din re jî hevkarî ava kir. Eşkere ye ku buhayê petrolê niha ji bo piştgirîkirina budçeya Rûsyayê pir guncav bûye.

### Bandora geşedanên herêmî li şerê Rûsya û Ukraynayê

Dema ku buhayê bermîla nefta xam a Brent a herî baş berî şer di navbera 60 û 70 dolaran de bû, niha nêzîkî buhayê bermîlê 100 dolar e. Saziyên pêşketî yên wekî Saxo Bank, Goldman Sachs û Sosîtiyêh Gênêral amadekariya xwe dikin ku 200 dolar bibe temenê her bermîlekê. Ev tê wê wateyê ku li şûna kêmasiya budçeya plankirî, her çi qas hindik be jî, Rûsya dikare salê bi zêdeyî bi dawî bike, dahatên zêde di navbera 10 û 40 milyar dolaran de be û belkî jî zêdetir be. Bi awayekî gelemperî, şert û merc ji bo Rûsyayê guncaw bûne, bi taybetî ji ber krîza kûr a ku NATO tê re derbas dibe û kêmbûna moşekan li Washingtonê ji bo peydakirina hewcedariyên wê li her du eniyan jî, eniya Îran û ya Ûkraynayî. Tê zanîn ku rêjeya mûşekên Cruise Tomahawk ji 500 yekîneyan derbas nabe û Dewletên Yekbûyî jî red kir ku ev mûşek bigihêjin ber destê Japonya. Di heman demê de serkeftinên hêzên çekdar ên Rûsyayê, tevî ku li ser retmekî tenê, ne bû sedema rizgarkirina Xerson, Zaporizhzhia, Kramatorsk û Sloviansk, hem jî ne bi destxistina Kharkiv û Izyum, an jî rizgarkirina bi temamî ya Kupiansk. Li vir pirs derdikeve holê ku çima lêkolînek li ser istratejiya Rûsyayê ya li eniyê nîşan dide ku Fermandariya Giştî ji êrişên eniyên pêş dûr dikeve û êrîşên ji milan bi kar tîne, di heman demê de şerê domdar bi karanîna hemû amûrên heyî didomîne nemaze dronan, roket, bombeyên xwedî pergalên berfireh, pergalên agiravêjên giran, hwd… ? Di heman demê de hêzên Rûsî tenê piştî çend rojan li ser çeperên Ukraynayê bi gulebarana giran dest bi êrîşên xwe dikin? Lê gelo ev tektîk di cihê xwe de ne?

### Meşandina şerê taybet li dijî Ukraynayê

Tiştekî balkêş e ku ew bi temamî mîna taktîkên artêşa Awistriyayê yên di dema Împeratoriya Avusturya Macaristanê de ye. Agahî nîşan didin ku rêberên leşkerî yên Rûsî - bi serokatiya Serokê Fermandariya Giştî Valery Gerasimov û Fermandarê Bilind Vladimir Putin - ne tenê li serkeftinê digerin, lê dixwazin bi her awayî leşkerên xwe biparêzin. Di heman demê de, artêşa Rûsî şerekî psîkolojîk li ser artêşa Ukraynayê dide meşandin. Dema ku ew dibîne ku tu kes naxwaze leşkerên Ukraynayî bikuje û ew bi tenduristiya baş ji dîlgirtinê vedigerin, Ukraynayî meraq dikin ka gelo hêja ye ku ew li dijî Rûsyayê şer bikin.? Di van demên dawî de, Moskow balê dikişîne ser derketina rêxistinên veşartî li Ukraynayê, ji Odessa heta Chernihiv, di nav de jî Kiev. Wusa dixuye ku Moskow jî xwe dispêre "westandina Ûkraynayî" û bi hêsanî gelê Ukraynayê dehf dide ku dev ji fikra şer berde û li dijî hikûmeta Kiev serhildanan bide destpêkirin.




### Hêza Ukraynayê têrê dike?

Li gorî daneyên Kongreya Dewletên Yekbûyî, nêzîkî 2 mîlyon leşker hêzên çekdar ên Ukraynayê hatine kuştin hem jî birîndar, lê hîn jî hêzên yedek hene ku artêşê xurt bikin, ji ber ku herî kêm 19 mîlyon kes hîn jî li Ukraynayê dijîn. Dîsa jî, heger em zarok, jin û kal û pîran derxînin, ji sedî 30'ê vê hejmarê dimîne, ango di navbera 6 û 7 mîlyon kesan de, ew kes jî di saziyên dewletê, çandinî, pîşesazî, xizmetguzarî û tamîrkirina alavên leşkerî de bixebitin. Wekî din, tevî ku Zelensky bikaribe mîlyonek kesên din jî seferber bike, ev yek jî zehmet e ku pêkwere, ji ber ku li Ukraynayê herî kêm 250 hezar heta 300 hezar fîrar ji artêşa Ukraynayê hene, ji bilî ciwanên ku ji leşkeriyê dûr di nava malbatê de xwe vedişêrin, ev melyon hîn jî hewceyê perwerdehiya şer in. Fermandarê berê yê artêşa Ukraynayê, Valerii Zaluzhnyi (niha balyozê Ukraynayê li Brîtanyayê ye) di çapemeniya Amerîkî de nivîsî ku perwerdekirina di navbera 100 hezar heya 150 hezar leşkeran de nêzîkî şeş mehan domand, tevî ku rewş wê demê aramtir bû.

### Piştî 4 salan ji şer, agirbesta Ukrayîna û Rûsya…

Rûsya û Ukrayna 11'ê Nîsanê hev du tawanbar kirin, sedem ew jî ku agirbesta hat binpêkirin, agirbesta ku piştî şerê çar salan hat pêkanîn, tenê çend demjimêr piştî ku agirbest bi boneya Cejina Paskalya ket meriyetê. Waliyên herêmên Kursk û Belgorod ên Rûsyayê gotin ku balafirên bêmirov ên Ukraynayî êrîşî hedefên li deverên sînorî kirin û di encamê de pênc kes birîndar bûn. Fermandariya Giştî ya artêşa Ukraynayê ragihand ku hêzên Rûsî agirbesta 32 saetan nêzî 469 caran di nav de êrîşan de, topbaran, bombebaran û êrîşên drone, binpê kiriye. Serokê Rûsyayê Vladîmîr Pûtîn 9'ê Nîsanê agirbest ragihand, ku ji 4'ê êvarê dest pê kir û Ukraynayî Volodymyr Zelensky pabendiya xwe bi agirbestê piştrast kir. Reuters nikaribû raporên têkildarî çalakiyên leşkerî xwe piştrast bike. Parêzgarê herêma Kursk Aleksandr Khinshtein, li ser bernameya Max nivîsî û got ku droneke Ukraynayî stasyona sotemeniyê li bajarokê Laikhov armanc girt û di encamê de sê kes birîndar bûn, di nav de zarokek jî hebû. Wî destnîşan kir ku êrîş piştî destpêkirina agirbestê pêkhat.

### Tewanbariya dualî ya Rûsya û Ukrayniyayê ji bo binpêkirina agirbestê

Fermandariya Giştî ya Ukraynayê, di raporekê de êvara 11'ê Nîsanê li ser pêşketinên li eniyê belav kir, wê diyar kir ku wan ji 13:00 GMT ve 469 binpêkirinên Rûsyayê yên dijî agirbestê tomar kirine. Di daxuyaniyê de wiha hat gotin: "Bi taybetî, 22 çalakiyên êrîşkar ên dijmin, 153 bûyerên bombebaranê, 19 êrîşên balafirên bêmirov ên êrîşkar... û 275 êrişên dronên keşfê. Di heman agirbestê de ku sala borî ji bo Paskalyayê pêkhat, her du alî tawanbariyên binpêkirina peymanê li dijî hev kirin. Serokê Ukraynayê Volodymyr Zelensky di axaftina xwe ya tomarkirî ya 12'ê Nîsanê li ser binpêkirina agirbestê neaxivî. Wî careke din got ku welatê wî dê rêgeza agirbestê hilbijêre û hêvî kir ku agirbest dirêjtir berdewam bike. Ev agirbest berdewam nekir, dema ku cejina Paskalya, agirbest bi dawî bû û şer dîsa derket.



Dilyar Cizîrî

## DAIŞ'ê bê deng mezin dikin!

Piştî êrişa hikûmeta demkî ya Sûriyê li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê hin girtîgehên DAIŞ'ê yên di bin serweriya QSD'ê de bûn ketin destê çekdarên hikûmeta demkî de. Di wan girtîgehan de bi hezaran çete hebûn. Bi taybet girtîgeha Şedadê û El Eqtan a Reqayê. Li aliyê din di kampa Holê de bi dehezaran malbatên endamên DAIŞ'ê û DAIŞ'iyên jin hebûn. Hejmarek mezin biyanî û Îraqî di kampê de hebûn. Hêzên Kewalisyona Navdewletî ya li dijî DAIŞ'ê derdora 9 hezar çeteyên DAIŞ'ê yên ji aliyê QSD'ê ve hatibûn girtin, birin Îraqê.
Lê pirsa niha xwe dide der çeteyên salên 2014-2015'an li Sûriyê û Îraqê sûcên li dijî mirovahiyê pêk anî li kur bi cih bûne. Li aliyê din jî bi salan bû li şaneyên DAIŞ'ê li dijî QSD'ê êriş pêk tanîn. Tevî hin rapor dibêjin ji destpêka sala 2026'an û heta niha 38 êriş li dijî hêzên hikûmeta demkî pêk hatine. Tê texmînkirin DAIŞ'ê ew êriş pêk anîbin. Lê di heman demê de behsa tesfiyeya navxweyî di navbera komên çekdar ên tevlî Artêşa Sûriyê ya nû bûne, tê kirin. Ev tercêh hîn zêdetir nêzî rastiyê ye. Ji ber bi hezaran çeteyên DAIŞ'ê berê xwe dan saziyên dewletê û di wir de cih girtin. Ev di êrişên rojên destpêkê yên HTŞ'ê li Helebê û heta girtina Şamê diyar kir. Di heman demê de di komkujiyên Peravê, Siwêda û herî dawî li Heleb û herêmên din ên Bakur û Rojhilatê Sûriyê diyar kir. Hejmarek zêde ya DAIŞ'iyan bi cilên fermî yên Artêşa Sûriyê de hatine erkdarkirin. Di heman demê de hejmarek mezin a çeteyan di saziyên sivîl ên dewletê de hatin bi cihkirin. Zihniyeta DAIŞ'ê bi xurtî niha di saziyên fermi yên dewleta Sûriyê de ye. Êrişa li Parmêla ya li dijî leşkerên Amerîkî van rastiyan xurtir diyar dike.
Ev metirsî her ku diçe li ser gelê Sûriyê û welatên cîran jî zêdetir dibe. Di heman demê de li ser ewlekariya cîhanî jî metirsiyeke mezine.
Ji ber hêzên navdewletî û di serî de Amerîka û Koalîsyona Navdewletî bi şerê li dijî Îranê û bandorên wê yên aborî û siyasî mijûl bûne, dosya Sûriyê danine aliyekî. Ev rewşa herî metirsîdar e û zemîna mezinkirin û belavkirina DAIŞ'ê hîn zêdetir dike. DAIŞ'ê û aliyên navdewletî yên piştevaniya wê dikin, niha bi fermî û bêyê deng ji xwe bînin, hêza DAIŞ'ê mezin dikin. Di hin raporan de tê gotin ew ê li dijî şerê Heşid El Şebî û Huzib Al ah de werin bikaranîn. Lê ya rast mezinkirina DAIŞ'ê ya bê deng ji bo pirojeyên mezin tê bikaranîn. Ev mijar di çarçoveya pirojeyeke metirsîdar de tê bikaranîn.
Dibe demekê bikşîne, lê dê çeteyên DAIŞ'ê ji aliyê hêzên navdewletî û di serî de Amarîka bi awayekî xurt di herêmê de were bikaranîn. Ne wisa ba dê Amerîka dest ji mesref û keda zêdeyî 12 salan a tekoşîna li dijî DAIŞ'ê bernedaba. Di nerîna min de ev çeteyên em behsa wan dikin dê bibin jêdera serke ya hilweşîna Artêşa heyî ya Sûriyê jî.



# Di dîrokê de yekem peymana kevnar ya aştiyê; Peymana Kadeşê

Peymana Kadaşê di dîrokê de yekem peymana aştiyê ya nivîskî ye ku di navbera Împaratoriya Misrê û Împaratoriya Hîtîtan de, li ser axa Mezopotamyayê hatiye îmzekirin. Piştî şereke dijwar û demdirêj îmzekirina vê peymanê rê li pêşiya şer û pevçûnan girtiye, deriyekî nû ji diyalog û çareseriyê re vekiriye.

**Navenda Nûçeyan**

Rêber Apo di hevditina xwe ya, 27'ê Aderê de bal dikêşe ser peymana "Kadaşê" û wiha dibêje Peymana aştiyê ya mezin a yekemin di dîrokê de Peymana Kadeşê ya navbera Hîtîtan û Misiriyan de bû. Divê derbarê de me wek Rojnameya Ronahî raporek amadekir ka peymana kadaşê çiye çima Rêber Apo behsa vî peymanê dike.

### Çima Şerê Kadaşê?

Di sala 1274'an berî zayînê de, Şerê Kadeşê di navbera du hêzên mezin – împaratoriya Misrê bi serokatiya Ramses II û Împaratoriya Hîtîtan bi serokatiya Muwatalli III de diqewime. Li gorî çavkaniyên dîrokî, sedema sereke ya vî pevçûnê ew bû ku Ramses II di salên destpêkê yên serweriya xwe de biryar da ku ber bi bakurê Sûriyeyê ve biçe, daku kontrola axên ku Misrê berê li wir winda kiribûn vegerîne. Di heman demê de, Hîtîtiyan jî dixwestin ber bi başûr ve berfireh bibin û bandora xwe ya li herêmê biparêzin.
Her wiha guherîna alîgirtiya herêma Amurru (Amorium) û nêzîkbûna wê bi Misriyan re, aliyê siyasî zêdetir giran kir û şerê heyi bi şêweyekî rasterast gur kir. Yek ji bûyerên herî girîng di şer de tiştê ku wekî "Xapandina Mezin" tê zanîn bû. Casûsên Hîtîtan Ramses II şaş kirin û jê re gotin ku artêşa wan hîn dûr e. Ev jî bû sedem ku fîrawûn bi tenê yek beşa artêşa xwe (firqeya Amon) pêşve biçe bêyî ku li benda hêzên din bimîne.
Di encamê de, artêşa Hîtîtşyan bi êrîşeke dijwar û çavkor, bi erebeyan şerê (war chariots) bi ser hêzên Misrê ve çûn. Ew rewş bû sedema têkçûna Misriyan lê berxwedana şexsî ya Ramses II û gihîştina hêzên alîkar (Na'arîn) di wextê xwe de, şer vegerand ser rewşeke tewazûnê. Di aliyê leşkerî de bêyî ku her du hêz ji ser bikevin şer bi dawî bû. Misir nekarî bajarê Kadeşê bigire û Hîtît jî nekarîn artêşa Misrê bişkînin. Lê ji aliyê siyasî ve, pevçûnên paşîn di navbera her du hêzan de bûn sedema ku di sala 1258'an berî zayînê de yekem peymana aştiyê ya nivîskî di dîrokê de were îmzekirin. Ev peyman di navbera Ramses II û Hattusili III de hat îmzekirin û şertên wek rawestandina şer, hevpeymaniya parastinê û guhertina esîr û vegera koçberan di nav xwe de dihewand.

### Peymana kadaşê û rawestandina şer

Şerê Kadeşê yek ji şerê here giring di diroka kevnar de ye. Kadeş ne tenê ji ber dijwariya şer di dirokê de cih girtiye. Ew rê li ber peymana aştiyê ya niviskî vekiriye. Peyman wekî bingeha rê girtina şer û pevçûnên leşkerî girtin û pêşxistina Diyalogên çareseriya siyasî çawa pêş dikevin dide nişandayîn, ji bo domandina peymanên aştiyê rê li ber deriyeke nû û dirokî vedike. Rêber Apo jî ji bo çareserkirina pirsgireka Kurd li Rojhilata Navîn di 27'ê Sibatê de bi banga xwe ya dirokî ya "Aştî û civaka demokratîk" şerê demdirêj yên 50 salî veguhert pêvajoyê domdar ya aştiyê.

### Peymana kadeşê: yekem peymana aştiyê ya nivîskî di dîrokê de

Di sala 1258 berî zayînê de, piştê 23 salên şer yê bê encam, her dû hêz gihaştin rêkeftinekê, yekem peymana aştiyê ya belgekirî di dîrokê de di navbera wan de hat îmzekirin Mercên peymanê li ser tabletên zîv bi zimanê dîplomatîk ê wê demê, Akadî, hatine nivîsandin. Kopiyên Misrî di perestgehên Luxor, Ebû Simbel û Karnak de hatine dîtin, û tabletên ji axê li Hattusa,( peytexta kevin ya Hitîtiyan) li Tirkiyeya îroyîn, hatine dîtin. Kopiyek li baregeha Neteweyên Yekbûyî li New York City wekî sembola yekem peymana aştiyê di dîrokê de daliqandî ye.

### Xalên sereke yên peymanê

Peyman çend xalan pêk tê ku pêşîgirtina li her şerekî nû di navbera her du aliyan de ye, ji bilî bicîhanîna tedbîrên ku ji bo xurtkirina baweriya hevbeş hatine çêkirin. Xalên herî berbiçav evin:
- Rawestandina dijminatiya demdirêj di navbera her du aliyan de bi rêya sozek ji bo bidawîkirina şerên di navbera wan de hetahetayê, û pabendbûna ti aliyekî ji bo dagirkirina axa aliyê din.
- Avakirina hevpeymaniyek parastinê (parastina hevbeş), tê vê wateyê ku heke Misir ji hêla hêzek biyanî ve were êrîş kirin, Hîtît dê alikar be ku artêşa xwe bişînin da ku piştgiriyê bidin Ramses e.
- Zewacên siyasî ji bo xurtkirina vê aştiyê. Ramses II paşê bi Hattusili III, keça padîşahê Hîtîtan re zewicî, gavek ku wekî piştrastkirinek malbatî ya hêza hevpeymaniyê hate dîtin.




### Girîngiya Peymana Kadeşê

Girîngiya vê peymanê di wê rastiyê de ye ku ew ne tenê agirbestek bû, lê çarçoveyek yasayî û siyasî bû ji bo birêvebirina têkiliyên di navbera du hêzên reqabetkar de. Ji ber vê yekê, ew wekî xalek werçerxek radîkal di dîroka siyasî û leşkerî ya mirovahiyê de tê hesibandin. Di nav destkeftiyên wê yên herî girîng de ev bûn.
- Sazkirina prensîba hevsengiya hêzê wekî rêyek ber bi aştiyê ve, ne serkeftina leşkerî. Dema ku aliyên şer nikarin serkeftinek diyarker bi dest bixin, danûstandin dibe vebijarkek esasî.
- Destpêka têgeha qanûna navneteweyî ya destpêkê, bi veguherandina pevçûnê bo çarçoveyek yasayî bi rêya peymanek nivîskî.

### Ji kadaşê heta roja îro û pêvajoya aştiyê ya domdar

Dema ku em ji dîrokê heta Roja me ya îro mêyze dikin, em dibînin ku hin ji dînamîkên ku Kadeşê birêve dibirin, bi taybetî di derbarê pevçûnên demdirêj yên li Rojhilata Navîn de hîn jî berdewam in. Di vê çarçoveyê de, Rêber Apo bi fikir û ramanê xwe bi dest pê kirina pêvajoya aştî û civaka demokratîk pêşî li şerê demdirêj yê Kurd û Tirkan girt. Ev şerê ku di dehsalên dawi yê de bi dijwarî hat meşandin tu cûdahiya xwe ji şerê kadaşê nebû. Ne ji aliyê leşkerî de, ne jî ji aliyê Siyasî û Dîplomasi ve tu serkeftinan bixwe re nanî. Jiber wî ji Rêber Apo li ser bingeha rawestandina şerê çekdarî ber bi tekoşina siyasî. Xortkirina dîplomasiya civakî û li ser bingeha Bidestxistina jiyana wekhev di çarçoveyek demokratîk de ku pirrengiyê nas dike da dest pê kirin.

### Encam

Di encamê de, em dikarin bibêjin ku ezmûna Peymana Kadeşê îspat kir ku şerên mezin bi serketinên biryardar bi dawî nabin, lê bi çareseriyên ku ji hêla hevsengiya hêz û şert û mercên herêmî û navneteweyî ve têne ferzkirin bi dawî dibin. Ev yek îro di pevçûnên berdewam ên li Rojhilata Navîn û cîhanê de eşkere ye. Bê guman, berawirdkirina Peymana Kadeşê bi pêvajoya aştiyê û civaka demokratîk re nayê wateya wekheviyek tevahî, lê belê qalibek dîrokî ya dubarekirî eşkere dike, dema ku pevçûn digihîjin rewşek bêçareseriyê, aştî dibe hilbijartinek stratejîk. Her çend Kadeşê destpêka fikra aştiyê di navbera împaratoriyan de nîşan da jî, projeya heyî modelek nû ya aştiyê temsîl dike ku ne tenê li ser bidawîkirina şeran lê di heman demê de li ser ji nû ve avakirina civakan jî disekine.
Peymana Kadeşê nîşan dide ku aştî ne encama binkevtina ne, lê belê encama fikrandin û diyalogeke kûr a hevsengiya hêz û berjewendiyan e. Ger dîrok carekedin xwe dubare bike, ji bo banga aştiyê bi ancam bibe lazime dewleta Tirk gavên cidi bavêje. Hebûna kurdan qebûl bike, çawa ku bi imzekirina peymaneke di navbera du hêzan de aştî çêbû, diyalog û peymana kadeşê ji bo her kesî aramiyê garantî kir.



Bîra Civakê

Ehmed Hesen

## Tevî cezayên Qeyser hatin rakirin jî, lê kirîz berdewam in

Erdnîgariya Sûriye di nava rêveçûna 14 salên tijî şer û alozî de rastî rûxandin, talan û ziyaneke mezin a binesaziyê hat, di encamê de bi milyonan malbat bê mal û cih û war man, koçber û penaber bûn û hatin windakirin û bi hezaran jî hatin kuştin, di vê dema derbasbûyî de û di encama cezayên Qeyser ên ku li ser rêjîma Esed ê ketî hatibûn sepandin, gelê Sûriye di rewşeke herî krîtîk a xizanî û bêkariyê de jiyan dikir, hem nirxê bihayan bilindtir dibû, hem jî di aliyê derbaskirina xwarin û pêdiviyên jiyanî de zehmetiyên mezin dihatin kişandin û ji aliyê bazirganan ve gel rastî dizî û bilindbûna nirxê kelûpelan dihat. Piştî ketina rêjîma Baasê di berfanbara sala 2024an de û heta roja îro hîna jî pirsgirêka xizanî, aborî û bêkarîyê di nava civaka Sûriye de tê jiyankirin, hikûmeta demkî ji destpêka hatina xwe de gelek soz dan gel ku wê rewşa aborî baştir bike û hewla rakirina cezayan bike, lê tevî van sozên ku dane jî, îro em dibînin mirov li kolanan li parçeyên nan digerin, taborên ji bo girtina topên gazê dirêj dibin, nirxê madeyên sotemeniyê her ku diçe bilindtir dibe û erebe dikin ku ji ber vê rewşê rawestin û tevgera çûn û hatinê pir kêm bibe, ev rewş dibe sedema ku gel careke din ji van reftaran bêzar bibe û rojên xirab ên di dema rêjîma ketî de bîne bîra xwe, di heman çarçoveyê de bê ewlehiya heyî hişt ku rojane rewşên dizî û şêlandina mirovan li ser riyên araze û vala derkevin. Ne tenê ev, civaka Sûriye taybet piştî derxistina pereyên nû ji aliyê gencîneya navendî ya Şamê ve ku du sifir hatin jêbirin, ew bi armanca baştirkirina nirxê lîreya Sûrî, lê berovajî pêşxistina rewşa aborî, hîna rewş kirîtîktir bû û nirxên madeyên sotemeniyê, hewş û malan, kirêdana firoşgeh û malan zêdetir bûn. Ev li şûna çareseriyê bû sedema derketina rewşeke ji berê xirabtir. Lewma jî ev kirîza aborî heta roja îro jî nehatiye çareserkirin, lewma jî wê nerazîbûnên mezin li dijî vê feraseta hikûmeta veguhêz a Şamê zêdetir bibin û zêde dibin jî. Mijar ne tenê rakirina cezayên Qeyser e, lê belê pêwîstî bi sînordarkirina rewşên gendelî, derketina aboriyê ji rewşa navendîtiyê, baştirkirina rewşa cotkaran li seranserî Sûriye, nexasim di aliyê kirîna tov û madeyên sotemeniyê de, her wiha firehkirina qadên ku civak karibe têde kar bike û baş berhem bide heye. Ev hemû jî pêwsîtiya xwe bi gavavêtinên şênber ên hikûmeta Şamê heye ku bi awayekî demildest destwerdanê bike û di aliyên kirîz tên jiyankirin de çareseriyên domdar jê re bêne peydakirin. Îro em dibînin ku civak ji tirsa ku lîreya Sûrî nirxê xwe winda kiriye re, hemû pereyên li gel xwe weke Dolarên Emerîkî bi kar tîne, ev jî encama kiryarên ku rê nadin pêşketinên aborî di xaka Sûriye de çêbibe.